

# welatî

Pêşmerge û  
leşkerê rom  
bi hev re



Rûpel 9

Sal:1 Hejmar:37 8-14 Mijdar 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Hilbijartina Meclîsa Neteweyî li Kurdistanê, Tirkîyê û gelek welatên Ewrûpa di 20–22 yê Mijdarê de çêdibe.


## Ji bo welitekî serbixwe

Rûpel 8



Hilbijartina  
Amerîka  
û rewşa  
dinyayê

Rûpel 4



Dawiya  
dîrokê?

Rûpel 12



Bi Nasir  
Rezazî re  
hevpeyvîn

Rûpel 16

# REWS



Abdullah Keskin

## Dinya diguhere

Dinya roj bi roj diguhere. Teknolojiyê dinya biçük kiriye. Îro tiştek li kudera dinyayê bibe bila 'bibe, mirov di eynî rojê, heta eynî saetê di kîliyekê de pê dihise.

Guherinê li welatekî çiqas dûr jî be disa tesîra xwe li welat û civakên din dike. Civakên dinyayê ji gelek aliyen ve bi hev ve girêdayî ne. Guherineke li Amerika an jî Rusya ji aliyê civakî, siyasi, aborî... ci bibe bila bibe di demeke kurt de tesîra xwe li ser civakên din jî dide xuya kîrin.

Ji bo vê yekê êdî ci guherinê ku li dinyayê çê bibin, mirov bixwaze nexwaze pê re eleqedar dibe. Îro gelek insanen Kurd û Tirk weke ku der hegê hilbijartînê serokatî ya Amerika de xwedî zanîn in, pirsgirêkîn welat û civaka xwe ewqasî nizanîn. Hilbijartînê li welatê wan ewqasî bala wan nakişinîn. Tesîra medya ya navneteweyî li ser civakê gelekî xurt e. Her roj bi saya televîzyon û rojnamîyan, rast-derew serên insanîn dadigirin.

Di vî babetî de hilbijartîna serokatiya Ameîka gelekî balkêş e. Hilbijartînê hînek Kurd û dewleta Tirk kire du seq. Dewletê ji Turgut Özal heta bi Süleyman Demirel, partiyêni siyasi û çapemeniyê ji bo alîkariya ku Amerika di "Şerê Kurdujî" yê de dide Tirkîyê, dom

bike dixwestin George Bush vê hilbijartîne qezenc bike.

Çapemeniyê û televîzyonan cihêtiya Bush û Clinton zêde mezin kirin. Ji hînek Kurdan wê ye ku Clinton were wê Kurdistan rizgar bibe, pirsgirêkîn gelê Kurd namînin. Tiştekî gelekî enteresan e: Me bihist ku li Kurdistanê, li deverna ji bo Clinton qezenc bike mewlûd dane. Însanen me jî diguherin, bi pirsgirêkîn civaka navneteweyî re eleqedar dibin, hema her guherin nayê mana pêşketinê.

Clinton û dora wî, Partiya Demokrat,

**Sistema Amerîka rûniştî ye. Çiqas însiyatîfa wan hebe jî serokatî sembolik e. Kongre, CIA, burokrasî, waqif û gelek mekanîzmayê din ku zêde xwedî biryar (karar) hene. Li dawiyê tiştên ku Clinton û demokrat karibin bikin gelekî bi sînor in.**

di mafêni mirovan de hînekî hessastir in, rast e. Têkiliyên wan bi "serokatîne Kurdistan" re hene, ev jî rast e. Li aliyê din Clinton bi xwe di xortaniya xwe de li diji cenga Wiet-namê derketiye. Cenga Dinyayê ya Dudyan, ji her alî ve damage xwe li civakên rojava xisti bû. Bill Clinton ev ceng jî nedîtiye. 46 salî ye, pişti John Kennedy re mirovekî ewqasî xort nebûye serokê Amerîka. Di kampanya xwe ya hilbijartîne de herdem behsa "guherînan" dikir. Pisporeni siyasi di serkevtina Clinton de tesîra vê sloganê nîşan didin. Ev hemû jî rast in lê

bi serê xwe tiştekî ifade nakin.

Ji ber ci? Ji ber ku sîstema Amerîka rûniştî ye. Çiqas însiyatîfa wan hebe jî serokatî sembolik e. Kongre, CIA, burokrasî, waqif û gelek mekanîzmayê din ku zêde xwedî biryar (karar) hene. Li dawiyê tiştên ku Clinton û demokrat karibin bikin gelekî bi sînor in.

Rejîma Tirkîyê jî hînekî dişibe ya Amerîka. Li Tirkîyê esas xwedî iktîdarê MGK ye. Parlemento, hikûmet hemû şeklî ne. Tu fonksiyona wan tune ye. Îro kîjan partî bibe hikûmet bila bibe tiştekî zêde ku karibe bike nîn e. Ji HEP'ê heta bi RP'ê ferq nake. Dixwaze ber sosyal demokrat an jî muhafazakar be, nikare tiştekî bike. Esas xwedî dawletê, ya ku raste rast iktîdar di destê wê de ye MGK ye. Ew jî ci ye? Ordi ye, MİT e... Hemû jî bi hevdu ve girêdayî ne.

Dev ji van lîstikan berdin. Bila tu hîvîyen we yên mezin ji bo wan çênebin. Hemû vala ne. Ger mirov li pirsgirêkîn xwe xwedî dernekeve, tu kes, ne Clinton û ne jî Özal, ji bo xatirê çavên me li wan nabe xwedî û wan çareser nake. Xelasiya me di destê me de ye! Ev demeke dirêj e ku li Kurdistanê, Tirkîyê û Ewrûpa, her devera ku Kurd lê dijin, amadekariya hilbijartîna Meclîsa Neteweyî dibe. Di 20-22'ye vê mehê de wê hilbijartînê çêbibe. Gel wê nûneren xwe yên heqîqî hilbijêre. Meclîsa gel wê damezire.

Ne hilbijartîna Qesra Spî û TBMM! Ne bindestiya kolonyalîstên biçuk û mezin; Irak, İran, Sûriye, Tirkîyê, Amerîka û Ewrûpa! Meclîsa Neteweyî Kurdistan.

Kurdino! Guh bidin vê hilbijartînê! Serxwebûn û azadiya Kurd û Kurdistanê di vê hilbijartînê de ye. Pîroz be!

## Mihê me li dij mehmetçik

Bawer Pîroz

Mihê lawikekî 11-12 salî ye. Lî, ji ber nexweşîya wî ya kêm çêbûna hestiya laşê wî mezin nebûye, wek zarokek 7 salî tê xuyakîrin. Ji xeynî vê jî zimanê wî giran e.

Rojek ji meha gulana 1992 an, leşkerên Karazê û Licê avêtîne ser gundê Tepecikê û wê paş ve bîzivîrin. Riya wan di ser gundê Mehmediyan re derbas dibe. Mihê û çend hevalen xwe yên zarok li binê Mehmediyan dixwazin riya 900 leşkerî bibrin. Bizmar û striyan (dirikan) li ser rê direşînîn û bi keviran ji bendê çedîkin. Mihê li ser bendê disekine û yên din xwe paş ve dikşînîn.

Konvoja leşkeran tevî cemse û panzêran ji Tepecikê birê dikeve û serê konvoyê dighîje ber benda Mihê. Konvoy disekine û serbazê leşkeran bi têlşîz xêber dide yên pey xwe û dibêje "Gerîla rê birriye, tedbiran bigrin." Li ser vê, leşker dora herdû gundan (Mehmediyan û Tepecikê) digirin. Li vir serbazê (üsteğmen) Licê dibêje "Em van gundiyan bidin ber gulan." Lî yê Karazê nade ber-

çavan.

Piştî wî, bi panzêran ber bi benda Mihê ve diçin. Li vir 4 tekelên panzêran diteqin. Mihê jî xwe qet tev nade. Dema têne nêzî wî sloganan davêje "Bijî PKK û bijî Apo" dibêje û bi destê xwe jî wek çek bikarîne, ji dil xwe ve wan gulebaran dike. Leşker çend caran li Mihê dixin, lê cardin Mihê ji sloganen xwe nayê xwarê û işaretâ serfiraziyê bilind dike. Paşê milê Mihê ba didin û wî bi xwe re kaş dikin.

Mihê tînîn nava gund û jê dipirsin, ka kê pê re bend çekiye û hevalen wî kî ne? Mihê wan li nava gund digerîne, wan dibe jêr û jorê gund, lê belê cîkî nîşan nade. Paşê mala xwe nîşan dide. Leşker pirr hêrs di bin û dikevin nava malan. He ma kî dikeve ber wan digrin û ji vana 8 xortan digrin dibin navçeya Karazê. Leşker di rê de li van 8 xortan dixin û ji yek ji wan ji xwe de diçe. Leşker diben qey mirîye û digirin ji e-rebê davêjin xwarê.

Li ser vê yekê gundi li hev dicivin û biryar didin ku herin

van xortan xilas bikin. Gundiyen bi emir derdikeye ser xanî û wiha bang dike:

-Geli gundiyan, dengê min tê we hemûyan. Leşkerên Tirk hatine 8 xorten me bê súc ji mal derxistîne û birine. Em hemû li meydana gund dicivin û diçin Karazê. Em heya van zaraken xwe xilas nekin ji Karazê nayin.

Gundiyan Mehmediyan tevî zarok, jîn û mirovên biemir ji mal derdikeyin û ber bi Karazê ve dimeşin. Di rê de xortê ku ji cemsê hatibûn avêtîn, radibe dighîje xelkê. Ew jî bi wan re dimeşe.

Dema gundiyan Mehmediyan digihîjin Karazê, Tepecikê ji bi hewariya Mehmediyan ve diçin. Gundîn der û dor jî dema dibihîsin xwe amade dikin, ku bêne Karazê. Qeymeqam mîze dike, ku pirs çiqas diçe giran dike, di cih de wan xortan ber dide. Gundî bi hev re paş ve dizivîrin û têne malê. Lî belê pirs li vir bi vî awayî naqede. Di 15'ê Tebabê de pirs, bi awayeke din tê holê.

## Rojnameya periyodîk me tatmîn nake

Birêz xebatkar nivískar û berpirsiyaren rojnameya Welat. Bi rastî heta niha xebat û lêkolînên we yên hîja çebûn jî alî ziman, siyasi û çandî ve. Ji bo vê xebata we ya hîja û giranbuha we pîroz dikim, ji we re jiyaneye serfiraz û pêşverû daxwaza me ye. Ji xwendevan, xebatkar, nivískar û berpirsiyaren re hezar spas. Geli hevalan li vir daxwaziyeke me ji we heye. Rojnameya Welat hî-

tabê gelê Kurd dike lê mixabin

êdî rojnameya periyodîk me tatmîn nake û êm layiqê rojnameyeke mezin û adetin e. ji bo buhayê wê jî civînekê çekin, buhayê wê ci ye, biryar bidin. Ez vê nameya xwe pêşkêşî raya xwendevan û berpirsiyaren rojnameya Welat dikim bimînin di xweşîyê de.

İbrahim Birûsk

### (HEVALA BÊRÎVAN) ZÜBEYDE SÖNMEZ

Tu roj nîn bûy, lê fîrêja te  
Çav li rojê dida girtin.  
Û ronahiya te ya  
germ û ron;  
Çiya, newal û deştên  
welatê te dikelijand  
Tu nayî ji bîrkirin  
xwişka delal.  
Ew bawerîya te,  
sondxwariye çîrandina  
rûpelên dîrokê yên  
reş û tarî ye.  
Rehet razê...



Li ser navê hevalen wê: Ahmet Demir

## FERHENGOK

Afir: (yemlik)

Avzêl: Avav, litav, ritam

(bataklık)

Bangeşî: Propaganda

Bidil: Dilhebîn (gönüllü)

Dewletên Yekbûyi yên

Amerîka: (Amerika Birleşik Devletleri)

Dinyadîti: (görgülü)

Dinyanedîti: (görgüsüz)

Gehîn: İdrak, têgîhîn (kavrama, anlama, olgunluk)

Gejgering: (kasırga)

Gelale: Nimûne, model

Geleş: Gelemse, gelece, munâqese, problem (sorun, karişıklık, ihtilaf, farklılık)

Gelhe: Nîfîs, nişteçîh

Gengazi: Derfet, imkan

Hawîrdor: Derdor, doraî (etraf)

Hinarik: (elmacık kemiği)

Koremişk: Kosnig, stevlok, xildê kor (köstebek)

Nâşor: (tirtîl)

Naştin: Definkirin, veşartin

Dinêje: Defin dike

Binêje: Defin bike

Paşdank: (sonek)

Pêşajo: Pêşeng (öncü)

Pêşbazî: Pêşbirk (Yarış, rekabet)

Pêşdank: Pêşpirtik (önek)

Peyxam: İlham, wehî (esin)

Pexşan: Nesîn (düz yazı)

Pêşhilbijartîn: (önsecim)

Pêşwazîkîrin: (karşılamak)

Qure: Kubar (kibar, kibirli)

Rêşander: Rêhber, pêşeng (yol gösterici)

Sebav: (alçak, hinoğluhin)

Sorik: (kızamık)

Şan: (hücre)

Şikbe: Qawiş (koğuş)

Xweragirtin: Xwegirtin (dayanmak, kendini tutmak)

Zûhbijartîn: (erken seçim)

# 'Dibistana leşkerî ya Delil Doğan' vebû

Navenda Nûçeyan- 29 Cotmeh 1992 - Li Dêrsimê nêzîki navça Hozatê, di nav hêzên dewletê û gerîlanyan de şer derket. 13 leşker hatin kuştin, 2 gerîla jî mir in. Li Melazgirê li nêzîki gundê Karakaya, konvoya leşkeran ket kemîna gerîlanyan, 5 leşker hatin kuştin, ji deh kesan zêdetir jî birîndar bûn.

Li Mazrayê (Elezîz) li navça Paloyê, gerîlanyan êrîsi ser qereqola Bulgurdere kîrin. 13 leşker hatin kuştin, 4 jî birîndar kîrin.

Li Mêrdinê li gundê Yüceli, gerîlanyan xayînekî kuştin. Di navbera Ruhayê û Sirucê de gerîlanyan êrîsi ser qereqola Sarımağara kîrin, xesar dane qereqolê.

30 Cotmeh 1992 - Li Erzînganê li navça Tercanê, 2 erekbên leşkeran ket kemîna gerîlanyan. 4 leşker hatin birîndarkîrin.

Li Bismilê, gerîlanyan avahiyen dewletê û emniyetê dan ber gule û roketavêjan, ev avahî gelek xesar dîtin.

Li navça Qoser (Kızltepe) mi-lîsén welatparêz erezbeyek polisan gulebaran kîrin.

31 Cotmeh 1992 - Li navça Navşan (Şemdinan) li herêma Mezargedîgi, gerîlanyan êrîsi ser cepîlxana (yığınak) leşkerî ku ji bo operasyonê pişta sînor amade kiribûn kîrin. 27 leşker kuştin.

Di navbera Erzîngan û Erzîromê de, erezbeyen leşkeran ket kemîna gerîlanyan, leşkerek hate kuştin 3 jî birîndar bûn.

Li Şîrnexê, gerîlanyan êrîsi ser kana (işletmeya) komîre û li nêzîki wê jî êrîsi ser qereqolekê kîrin. Weke çavkaniyê gerîlanyan dibêje, qereqol tev rûxiyaye (îmha bûye.)

Li Dêrsimê, Qerergeha Serleşkerî ya PKK'ye ya Dêrsimê daxuyaniyek belav kîrin. Di daxuyaniyê de qala îlankirina vebûna "Dibis-



Ordiya Tirk ev demeke dirêj e ku başûrê Kurdistanê operasyonan çedike. Lî livbaziyê gerîla jî li bakur roj bi roj xurt dîbin.

tana Leşkerî ya Delil Doğan" kîrin û gotin "Êdî Akademî ne tenê li Bekaa ye, li Botan, li Dêrsim, li Xerzan û li Amedê jî akademî vebûne".

1 Mijdar 1992 - Di navbera Cizîrê û Hezekê (İdil) de cesedê 2 xayînan bi direkki ve daleqandî hat dîtin. Ev xayîn ji alî gerîla ve hatibûn kuştin. Li Cizîrê qem-yoneke cerdevan Alihan Tatar hate şewitandin.

Li navça Sasonê, gerîlanyan êrîsi ser qereqola li nêzîki gundê Acar kîrin, qereqol texrip kîrin.

Li Nisêbinê gerîlanyan, erezbeyek polisan gulebaran kîrin. Di navbera Muşê û Gumgumê (Vartoyê) de gerîlanyan rê birrîn, ji erezbeyek 3 leşker derxistin û wana dil (esir) standin.

Li Çepkekçûrê, (Bingolê) xayînek hate kuştin.

Li Licê li nêzîki gundê Tuxê, di nav hêzên dewletê û gerîlanyan de şer derket, 4 leşker û muxtarê Gund hatin kuştin.

Li navça Nazimiyyê, ji bo gerîlanyekî ku li Şîrnexê şehîd ketibû esnafan dikanê xwe girtin.

2 Mijdar 1992 - Li Amedê li navça Piranê (Dicleyê), gerîlanyan êrîsi ser qereqola Bağçeköy kîrin, gelek leşker kuştin û qereqol texrip kîrin.

Di navbera Mêrdinê û Nisêbinê de li nêzîki Avasipî, gerîlanyan rê birrîn, erezbeyek BO-TAŞ'ê şewitandin.

Li Dêrsimê ji bo 5 gerîlanyen ku li Cizîrê şehîd ketibûn esnafan dikanê xwe girtin.

3 Mijdar 1992 - Li Kerboranê (Dargeçit), gerîlanyan êrîsi ser panzereke leşkeran kîrin di navbera wan de şer derket, 4 leşker û 2 cerdevan hatin kuştin.

Di navbera Dêrsimê û navça Pilemurê de, gerîlanyan rê birrîn, nasnameyan kontrol û propaganda kîrin. Ü leşkerekî kuştin. Li Şîwerekê, li taxa Karageçit û Gülabî, di cynî sactê de bombe avêtin ser 4 malen polisan, mirî û birîndari çenebû, mal şewitin.

5 Mijdar 1992 - Li Nisêbinê PKK'ê 8 endamên hîzb-î kontra kuştin. 5 saet bi sun vê, polisan şoferekî bi navê Bülent Dağar kuştin.

Kurtasiye" yê derdikevin û ber bi mala Şeyhîmus Kaya ve tê. Lî gerîlanyen PKK'ê li pêşîyan wan ke-mîn datînin û heşt kes ji wan di-kujin.

Çavkaniyê PKK'ê vê bûyerê wiha diñirxîn: "Ev her heşt kes ji kuştina gelek mirovîn me yên welatparêz mesûldar bûn. Me van kesan ceza kir. Termê 5 ên wan li morga "Sağlık Ocağı" ya Nisêbinê û 3 ji wan jî li gundê Xanîkê hatine binaxkirin."

Di dema vê bûyerê de jî rîwi-yek ku di rê de dimeşê bi gullên polisan tê kuştin. Gelek kes dibêjin ku Bülent Doğar (22) ji paş ve ji hêla polisan ve tê kuştin.

Di roja 4.11.1992 an de ji, saet li derdor 11.00 an li kolana "Lozan Caddesi" yê, karkerê belediyê Sultan Erol (30) ji aliye hîzb-î kontrevanan tê kuştin. Érişkarê vê bûyerê ji hêla gel ve tê girtin. Lî tu agahiyek der barê érişkar de bi dest neket. Li gorî didevanen bûyerê érişkar bi xwe polis e.

Ji bo protestokirina kuştina Sultan Erol, esnafen Nisêbinê di cynî rojê pişti nîvro de, derê dikanê xwe girtin.

## Li Nisêbinê tolhildan

Navenda Nûçeyan- Li navçaya Nisêbinê ku girêdayî bajarê Mêrdinê ye, heşt endamên hîzb-î kontra ji aliye militanên PKK'ê ve hatin kuştin û du kes jî birîndar bûn.

Li gorî agahiyen gihîstine destê me bûyer wiha qewimiye. Di 3.11.1992 an de saet li derdorê

## Abdulsamed Sakîk qetil kîrin

Navenda Nûçeyan- Dewlet, bi destê kontrayan kuştina rewşen-bî û welatparêzê Kurd didomîne. Ji kuştina Wedat Aydin û vir ve bi sedan welatparêz û rewşenbîr bi destê kontra û hîzb-î kontrayan hatin kuştin.

Roja 3'yê Mijdara 1992'an, Abdulselam Sakîk roj li nîvro ji alî vê hêzê ve li Entabê hate kuştin. Abdulselam Sakîk kekê me-bûsê Mûşê Sirî Sakîk bû. Birayekî wî jî, gerîleyekî bi nav û deng e.

Abdulselam Sakîk pişti kuştina Wedat Aydin bi çend rojan, ji alî çend kesen bi çek, di mala xwe de hatibû tehdîtkirin. Abdulsamed Sakîk, derî li van kesen ku ji xwe re dibêjin em polis in ve-nake û bi telefonê xeber dide rîvebirê HEP'ê. Dawî li midûre emniyeta Entabê jî digere û midûr dibêjê ew kes ne polis in.

Abdulsamed Sakîk demek direj serokatiya HEP a Entabê kîrbû. Ji ber welatparêziya xwe û nav û dengê malbatâ xwe gelek caran hatibû tehdîtkirin.

# HAWAR

## Dilbixwîn

### Şorbeparêzî

Di 1'ê Cotmehê de meclisa cehşikan bîryar stand ku heqê tirşik û şorbeya Tîrkan bidin. Belê, pişti têkçûna serhildan gelê me li başûr (1991), pêşmergeyan çek avêtin, legan hilgirtin û çûn ji bo firek şorbe, hezar cari xwe li ber potîna dijmin xwar kîrin. Niha jî Berzanî-Telabanî heqê (mafê) wê tirşikê didin.

Li ser şorbeparêzî û tirşikperweriya wan ez vê nameyê ji dayîka xwe re dinivîsinim:

Dayîka xemgîn,

Dilber û dilovana hêja,

Ez baş dizanim tu bi kurdî nizanî binivîsînî û bixwînî. Gelo, emê wê rojê bibînî ku dayîkên me rojname û romanên bi Kurdî bixwînî?! Ji lew re bila hevalekî têgi-hîşti ji te re nameyê bixwîne.

Em gelekî ji hev dûr in, ne name û ne jî hevdîtin, lê dilê me bi hev re lê dide. Li min negire, tu baş dizanî dema me ji bo nivîsandina name û mektûban ne fireh e. Kar gelek e bar gi-

ran e. Li aliye kî dîlana avakirina meclisa netewî ya Kurdistanî digere, li aliye kî kampanya azadî û avakirina Kurdistanê... û li aliye din êrîşen mehmetcik û şorbeparêzan. Dixwazin me bikin sendewîç, dixwazin me di nava xwe de bihîrin, tu ji vê yekê re ci dibêjî dayê?

Xeman nexwe, bila çavên te hêstiran nebarî-

nin, heya ku yok ji me şehîd dikeve deh ji wan têne kuştin. Berê mehmetcik û cerdevan bûn, niha pêşmerge jî tevlî wan bûne.

Emê bikujin dayê! Ew ne birayen me ne, em tu caran xayînan wiha ji xwe re bira nabînin. Divê Kurdistan ji xayînan paqî bibe, ew bi çend kevçî şorbeyan namûsa xwe jî difiroşin, ne tenê namûs, ew bi nanezikî xiyaneti ya herî mezîn dikin.

Xwezi te li nûçeyan guhdarî bikira dayê! Mesûdê ku me digot ew kurê bavê kal e, eşkere bêrûmetî û nandoziya xwe tîne ziman û dibêje: "Bijî Cumhûriyeta Tirk, Bimire PKK" ji vê tometê mezintir tiştek heye! Tu dizanî çîma vê sloganê davêje? Bersiva vê pirse ya yekemîn ev e: Ji bo razîkirina karbîdestê Tirk û standina çend kuluwan û çend dolaran, ev sloganê bêrûmetiyê tê avêtin.

Di dema vê bûyerê de jî rîwi-yek ku di rê de dimeşê bi gullên polisan tê kuştin. Gelek kes dibêjin ku Bülent Doğar (22) ji paş ve ji hêla polisan ve tê kuştin.

Di roja 4.11.1992 an de ji, saet li derdor 11.00 an li kolana "Lozan Caddesi" yê, karkerê belediyê Sultan Erol (30) ji aliye hîzb-î kontrevanan tê kuştin. Érişkarê vê bûyerê ji hêla gel ve tê girtin. Lî tu agahiyek der barê érişkar de bi dest neket. Li gorî didevanen bûyerê érişkar bi xwe polis e.

Gerîlayen me, egidêne me ne, qehreman û çavbe-lekên me ne, ew kî ne, ci ne da ku têne van lehengan di-

kujin! Bilişîne, li şûna reşê desmala rengîn girê bide, li şûna hêstran her du lêvan bikenîne, bila şalûl û bilbil bi-te re bikenin. Bi ser gerîlayen de strana "Herne Pêş" bixwîne, hezar nifir û nifrinan bi ser Berzanî-Telabanî de biberîne.

Pîroz be dayê, xiyanetê, heya dawiyê xwe eşkere kir, şoreşa me jî derbasî merheleyeke nû bû. Tu caran F-104 û rew rewa pêşmergeyan xayîn nikarin me bitir-sînîn, em hînî revê nebûne. Bi bayê azadiyê re, li gel silavê şoreşgerî.

# Hilbijartina li Amerîka û rewşa dinyayê

Ev demeke dirêj e ku hilbijartina ji bo serokatiya Amerîka, di rojeva dinyayê de cihêkî gîring digire. Li gelek welatan ev hilbijartin, wek hilbijartina serokatiya dinyayê dihate nîxandin. Lewre piştî hilweşîna sistêma Sovyetê, li hember Amerîka tu hêz û dewlet nema-bûn. Amerîka li gor berjewendiyên xwe, ji bo dinyayê nîza-meke nû afirandibû. Li gor vê nîzamê, Amerîka tesira xwe ya li ser welatên dinyayê zêde kîribû û hemû dewletên dinyayê li gor vê nîzama nû girêdanên xwe yên bi Amerîka re, li gor daxwazên vî welatê împeryalist ji nû ve bi ser û ber kîrbûn.

Iro Amerîka patronê dinyayê ye. Ji ber vê jî hilbijartinê li vî welatî, ji xelkê Amerîka bêhtir, welatên dinyayê têkîdar dike. Lewre, ji bili çend welatên Ewrûpa û Japoniya, bi giştî hemû welatên dinyayê pîr an jî hindik, di warê aborî de, bi vî welatî ve girêdayî ne û têkîliyên van welatan û Amerîka gelek caran li gor politikayê Amerîka û

berjewendiyên wî yên derive bi rê ve diçin.

Tirkîye jî, yek ji wan welatan e ku, bi hemû sazî û dezgehê xwe li gor politika û berjewendiyên Amerîka û bi ferinan û daxwazên vî welatê împeryalist politikayê xwe tesbit dike. Tirkîye bêyi Amerîka nikare tu tiştî bike. iro Tirkîye li gor nizama dinyayê ya nû, ku Amerîka li gor berjewendiyên xwe afirandiye, li Rojhîlata Navîn cendermetiya vî welatî dike. Ji ber van girêdan e ku, serok û rîvebirêne Tirkîye li gor germiya têkîliyên xwe yên bi rîveberiya Amerîka re rûmet digirin. Turgut Özal, ku Serokkomarê Tirkîye ye, bi saya têkîliyên xwe yê bi Serokê Amerîka yê kevin George Bush re, derdi-ke manşetên rojnameyan û di televizyon û radyoyan de, qala dostaniya xwe û George Bush dikir. Ev beyanên bêşexsiyet, li Tirkîye dibûn sedemê rûmet-ditînê.

Hilbijartina Amerîka bi serfiraziya Bill Clinton xelas bû. Bi vê encamê re, li Tirkîye di



Bill Clinton, serokê Amerîka yê nû.

nav berpirsiyarên dewletê de tirsek peyda bû. Lewre Bill Clinton di dema hilbijartinê de, li ser hin xalêngirîn beyan dabû. Yek ji wan xalan, girîngiye mafêni mirovan bû. Bill Clinton di kampanyayê xwe de jî li ser vê meseleyê geleki rawestiyabû û ji sedemê karkirina wî yek jî ev bû.

Iro burjûwaziya dinyayê, bikarkirina Bill Clinton re, mizgîniya demeke nû didin dinyayê. Lî, Amerîka, wek welatekî împeryalist, dê politikayê xwe, her li gorî berjewendiyên xwe tesbit bike û ji bo welatên dinyayê, ta ku xwe ji bin vê mijokdariyê xelas nekin, rûpeleke nû venabe.

## 'Xwefiros'

Norwec, Welat-Rojnameya Norweci, Klassekampen di 29'ê Cotmeha 1992 an de bi kurtî rewşa Kurdistanê ya îroyîn şirove kiribû.

Nivîsar ji aliye berpirsiyarê giştî ya rojnameyê ve hatibû nivîsandin. Sernivîsara wê jî "Li Kurdistanê Quisling (Xwefiroşan)" bû.

Rojname li ser êrişen dewleta Tirk û pêşmergeyan radiwestê û hevkariya wan wiha lec dike: "Li başûrê Kurdistanê dewleta Tirkîye û pêşmergeyan bi hevkariyekê êriş birin ser bargehêne PKK'ê. Planen êriş û çalakîyan ji aliye M. Berzanî, C. Telabanî û Serokê Dewleta Tirkîye ve bi xebateke hevkari hatine amadekirin."

"Em dikarin bi hêsanî vê bibejin; ew herdu serokên Kurdan ên Başûr bi temamî di berîka Tirkîye û Amerîka (USA) de ne. Wan di şerî li diji Iraqê de jî alîkariyeke mezin dabûn USA yê. Ger gelê Kurd xwe ji serokên wiha rizgar neke, ew dê hîn pîr caran rastê xîyanetiyan wilo werin."

Berî vê jî di 8.9.92' an de rojnameya Dagbladet ji ni-vîsareke mezin li ser têkîliyên Berzanî-Telabanî, ên bi Tirkîye û George Bush re wiha nivîsibû:

"Serokê Amerîka Bush, li hemberiya Sedam Huseyin piştgiriya Kurden Başûr dike. Lî herdu partîyen mezin ên Eniya Kurdistanê PDK û YNK soz dan Bush ku dê ew ji bo dewleteke serbixwe û azad şer nekin, jîxwe Tirkîye ji vê naxwaze.

Ji aliye din ve di bernamaya PKK'ê de heta dawî serxwebûnî heye. Ew li diji endamê NATO bi Tirkîye re şer dike. Lewma jî ew tiştekî aşikare ku Bush alîkariya Tirkîye dike.

Ji bo pirraniya Kurdan xewn, Kurdistanê azad û serbixwe ye. Lî ji ber takîkîn politikî ên kurt, ku ji aliye serokê wan ve hatine meşandin, heta iro pîr caran xewna Kurdistanê azad hatiye pelçiqandin.

Ev di şerî navbeyna Iran û Iraqê de wiha bû û niha jî wiha ye. Ger Serdariya Sedam Huseyin têk biçe, wî çaxê divê Berzanî û Telabanî, ji xwe re hevparên nû bibînin."

## GOTİN



Yaşar Kaya

### Kurteçîroka "Deng"ê

Hevalê hêja Huseyîn Deniz, di Welat de, ji bo kovar û rojnameyên Kurdi, nivîsarek nivîsiye\*. Dibêje: "Heta niha gelek kovar û rojnameyên Kurdi derketine. Hin ji yên ku ev rojname û kovar derxistine hê jî sax in. Ev kes çîma kurteçîroka derketina van berheman ñanîvisin?"

Birayê Huseyîn rast dibêje. Em Kurd tiştekî nani-visin. Her tiştî bi xwe re dibine gorê. Di sala 1963 an de, em 49 kes cara pêşîn ji girtîgehê derketibûn. Hikûmeta wê demê, piçek ber bi demokratiyê ve diçû. Em çend heval civiyan. Me got, hewce ye em jî tiştek çêbikin. Me gişan qewlê xwe kir yek ku em kovareke Kurdi-Tirkî derxin.

Gorbuhuşt Ziya Şerefxan, lingê xwe dabû erdê, digot: Bila Seid Elçi jî tevî we di redaksiyona kovarê de cih bigire." Di wê demê de jî, em bûbûn du parçê û ji hev qetiyabûn. Xwedê qebûl neke, hinek ji me bûbûn çep, hinek ji me jî bûbûn rast. Wê demê, ne çepê me dizanibûn soyalistî ci ye, ne jî rastê me dizanibûn kapitalistî ci ye. Ji ber van sede-man, me Elçiye nemir nedixwest. Em ji hev qetian.

Me bîryar da.ku em bê Ziya Şerefxan û Seid Elçi kovarê derxin. Me ji xwe re li Bab-i Alî, di karxana Trakya de, odayek kirê kir. Ji der û dor jî 2 mase peyda kir, lê daktîloyen me tune bûn. Dawî me ew jî peyda kirin. Cara pêşîn, me nameyek çap kir. Bi kurtayî me wiha digot: "Li vê navnîşanê em dê kovarekê derxin. Navê wê Deng e. Deng, dengê Rojhîlatê ye. Em dê derd û kulên gelê xwe binivîsin. Em dê di nivîsaren xwe de, giraniyê bidin ser aborî, çand û ziman. Xebat ji me,

**Birayê Huseyîn rast dibêje. Em Kurd tiştekî nani-visin. Her tiştî bi xwe re dibine gorê. Di sala 1963 an de, em 49 kes cara pêşîn ji girtîgehê derketibûn. Hikûmeta wê demê, piçek ber bi demokratiyê ve diçû. Em çend heval civiyan. Me got, hewce ye em jî tiştek çêbikin. Me gişan qewlê xwe kir yek ku em kovareke Kurdi-Tirkî derxin.**

alîkarî ji we." Me ev name, ji çiqas Kurdên ku me navnîşana wan dizanibûn re şand. Hinek şaş mabûn. Digotin: "Di vê demê de û bi Kurdi nivîsandin! Bi Xwedê û pêxember van zarokên me aqlîn xwe bi sîr û pîvazê re xwarine."

Ev kar li ser milê sê-çar hevalan ma-bû. Di vê xerîbî, tenêtî, zor û zehmetê de meyê çawa ev kovar derxista? Ziya Beg nihêrt ku dê ev kar here serî. Ew jî çû rûnişt nameyek nivîsî û belav kir. Di wê nameyê de wiha digot: "Ez û Seid Elçi jî, em dê kovarek derxin. Navê wê kovarê jî "Riya Rast" e. Lî ew ên ku Dengê derdixin, wisa xuya ye ku çep in." Pişti vê nameyê belav dike, berê xwe di-de Enquerê. Li wir heval dora wî digirin û dipirsin, "Tu çawa dizanî ku ev heval çep in?" Nikare bersivek rast bide hevalan. Heval giş jê dixeyidin. Dawî ne Riya Rast derket û ne jî tiştekî din. Lî di dawî de, di hin ansiklopedî û pîrtûkan de, ji bo Riya Rast gelek tiştîn ne rast hatin nivîsîn. Riya Rast kovarek nîn bû, tenê nameyek belavkirin ku em dê kovarek wiha derxin.

Hejmara Dengê -1- derket. Ez berpirsiyarê nivîsaran bûm. Bi bîryara dadgeha Stenbolê ez hatime girtin û min şandin girtîgeha Sultanahmedê. Ez 47 rojan li wir girtî mam, paşî jî hatim berdan. Dema ez di hundir de bûm, hejmara 2 an derket. Ez li derive bûm, lê müşextî (qaçax) bûm. 23 hevalên me hatibûn girtin. Gerîna Awarte (Örfî İdare) li min digeriya, min jî xwe vedîşart. Ez û hevalek me hejmara 3 an derxist. Polis li çapxanê dest danî ser vê hejmarê. Çend roj bi şûn ve, ji bo Dengê ez çûme dagehê. Li wir min jî girtin û birin.

Min kurteçîroka Dengê nivîsiye, dê ev pîrtûk di van rojan de derkeve.

\*Min vê gotarê beriya şehîdbûna Huseyîn Deniz nivîsibû.

## Têkiliyên Almanya û TC

Wezirê Karê Derve yê Almanya Volker Ruehe, li ser çekên ku Almanya ji bo pêkanîna armancen NATO'yê dide Tirkîye û bikaranîna wan ê Kurdistanê li Tirkîye serdanek (ziyaret) pêk anî. Volker Ruehe di vê serdana xwe de, bi giştî li ser bikaranîna van çekan rawestiya û kîrinê dewleta Tirk a li dijî mafen mirovan nenirxand û li ser vê meseleyê tu tişt negot. Li gor Almanya, dewleta Tirk li Kurdistanê dikare her tiştî bike, dikare gel qir bike, mirovan li dû tanqan kaş bike û bikuje, bes ne bi çekên ku Almanya dide Tirkîye. Ev jî baş nîşan dide ku Almanya di kîrinê li dijî mafen mirovan de, durû ye û vê meseleyê cidi nagire.

Li aliye din, ev çekên ku Almanya dide Tirkîye, di têkiliyên van herdu dewletê împêrialist de astengiyen derdixe û Almanya ji bo rastkirina van têkiliyan şert dide pêsiya Tirkîye. Yek jî wan şertan, derxistina van çekan ji herêmeye, lê Tirkîye xwe nadî ber vî karî.


## Grevê birçibûnê

Greva birçibûnê ya ku girtiyen Elezîzê berî 35 rojan dest pê kiribû, dom dike. Rewşa ten-durustî (sihet) ya kesen beşdarên grevê, hêdi hêdi xera dibe. Li aliye din, rèveberiya girtigchê ji gelek tengasiyan derdixe pêsiya têkili û danûstandinê navbera girtî û evükâtên wan. Ji bo pejirandina daxwazên xwe, girtiyen gilînameyek dan Wezareta Edaletê. Di gilînameya xwe de gotine ku, ger daxwazên wan neyîn qebûlîrin wê greva xwe veguherînin greva dem-nesinorkiriyê.

Ji ber zilm û pestâ di zindanê Komara Tirkîye de tênen meşandin hîna li zindanekê greva birçibûnê an ji rojiya mirinê naqede, li yeke din tiştîkî diqewime. Hêja berî çend rojan li zindana Bucayê rojiya mirinê qedîya, iro jî li Elezîzê greva birçibûne gihîştiye 35 rojiya xwe.

## Dev-Sol du polîs kuştin

Li bajarê Stenbolê, li taxa "Şehremini Pazartekke" yê di 4.11.1992 an de, saet li tanga 18.45 an de, erebeya polisan ji hêla 4 kesan kú yek jê pîrek bûye hate gullebarankirin. Di dema bûyerê de du polîs di cib de can didin û yek jî birîndar dibe. Pişî bûyerê yekî ku nasnama wî nehate naskirin li rojnameyan geriya û bûyerê li ser navê "Devrimci Sol-Silahlî Devrim Bîrlîkleri (Çepê Şorşer, Şaxen Şorşer ên Çekdar)" hilgirte ser xwe. Sedema vê bûyerê infaz û windabûnê di bin çavan de ne.




Salih Sümer



Adnen Ekmen



Muzaffer Arıkan



Abdulkerim Zilan

## Mebûsên 'Tîrşîkçî' ji ber ci ji SHP'ê venaqetin

**Enqere, Welat-** Mebûsên Kurd ên ku di nav SHP' ê de cih digirin û ji aliye gelê Kurd ve wek "tîrşîkçî" tên binavkirin li ser xwîna gelê Kurd rûniştine û bi i-haleyêne dewletê xwe, dewlemend dikin. Rojnameya Welat ji bo rûyê van mebûsan eksekive bi ke, li dû vê pîrsê geriya û bi belge têkiliyan van mebûs û mutehîden îspat kir.

Ev mebûsên rûres, pêsi ihalayêne ku dewlet dê derxe mazatê tesbit dikin û dû re jî, van ihalayen bi bertîl (ruşvet) didin mutehîden naskiriyê xwe. Ev têkili ji ali dewletê ve ji tên zanîn, lê ji ber hin sedemên politik, ji vê

gemarê re çavêne xwe digirin û pirrê caran alîkari ji dikin.

Mebûsên firoşkarê xwîna Kurd ev in: Salih Sümer, Mehmet Gülcügül, Muzaffer Arıkan, A. Kerim Zilan û Adnan Ekmen.

Çend ihalayêne ku bi alîkariya van mebûsan hatine standin ev in:

1- Li Mêrdînê "avahiya hikûmetê" bi alîkariya mebûsê Mêrdînê Mehmet Gülcügül, mebûsê Batmanê Adnan Ekmen û mebûsê Mêrdînê Muzaffer Arıkan şirketa "Çankırı inşaat" distîne. Ev şirket ji bo ku vê ihalâne bistîne pereyek mezin ji bo

bertîl dide van mebûsan. Dawî ev ihalâne bi 22 milyarı li ser Çankırı inşaat'ê dimîne.

2- Di 5.10.1992 an de, li Kerboranê (Dargeçit) dewlet i-haleyâ avahiya hikûmete derdixe mazatê. Ev ihalâne ji bi alîkariya van her sê mebûsan li ser Şehmus Güzenoğlu dimîne. Şehmus Güzenoğlu ji bo vê ihalâne 350 milyon dide van mebûsan.

3- A. Kerim Zilan, ihalâ avahiya hikûmete ya Batmanê ku dê bi 14 milyarı bê çekirin da Estel inşaatê. Ji bo vê ihalayê 800 milyon pere dide A. Kerim Zilan.

Wekî din ev mebûs, wek mafayê, ji hemû ihalayêne ku li

herêmê çedîbin par distîn, bi hemû mutehîdan re di têkiliyê de ne û bêyi wan tu kes nikare tu tiştî bistîne. Dema pêwist be hinekan tehdît ji dikin. Muzaffer Arıkan ji bo meseleyek ihalâ şefen "Bayındırılık" a Mêrdînê Vedat Yılmaz û Hüseyin Aker tehdît dike da ku daxwaza wî bê cih.

Ev mebûs navgîniya çekirina girtîgeh, avahiyê, MİT'ê qere-qol û avahiyê hikûmete dikin. Li aliye gelê Kurd di wan avahîyan de têne qirkirin û li aliye din, ji ev mebûsên xwefiros, ji xwîna gelê Kurd, xwe dewlemend dikin.



## Li Alanya ci dibe?

**Navenda Nûçeyan-** Her ku têkoşîna neteweya Kurd bi pêş dikeve û hêviya xelasîya gelê Kurd bilind dike, dewleta Tirk bi hemû derfetêne xwe li dijî vê pêşveçûnê hin listik û senaryoyan li dar dixe. Li aliye weletaparêzên Kurd bi destê kontrayan dide kuştin û ji bo tunekirina serhildana gelê Kurd bi metodê Amerika hin saziyan (kurum) ava dike. Li aliye din, serê psikolojik di-domine û bi vî şerî psikolojik dixwaze gel demoralize bike. Wekî din ji, di nav gelê Kurd û Tirk de, li dû dijiminantyeke sunî digere.

Çapemeniya Tirk, parti û saziyen dewletê, bi yek dengekî, li dû dijiminantya gelê Kurd û Tirk di-gerin. Li hin bajar û navçeyen Tirkîye, xelkê herêmê bi ser Kurdan de dişinin û tovî neyartiyê di nav her du gelan de diçinîn.

Li herêma Ege, li hin bajar û navçeyen Derya Spî (Akdeniz) û Derya Reş (Karadeniz) bi alîkariya hin hêzîn şovenîst, gelê herêmê êrisi ser Kurdan dikin. Ev êrisi bi alîkariya çapemeni û hin hêzîn şovenîst pêk têne.

Divê li hember vê pêla şovenîzmê herkes dengê xwe bilind bike û Kurd bêhtir bi hev bigirin û xwe biparêzin.

## Hilbijartina 1'ê Mijdarê kê kar kir

**Navenda Nûçeyan-** Weke tê zanîn di 1'ê Mijdarê de, hilbijartina belediyan li nêzîkî 30 bajarok û beldeyan çêbû: Di dawîya hilbijartîne de, ji aliye rayan ve Partiya Refahê (PR) bû yekemîn. Di bidesxistina mewkiyêne belediyan de, Partiya Riya Rast (DYP) bi ser ket.

Rojnameyên burjûwaziyê giş, bala raya giştî dikisîn ser %25 rayen PR'ê. Ev partî, di hilbijartina 1991 an de, %17 ray standibû. Rojname giş bi hev re %25 rayen PR'ê derdixin pêş û vê partiya "islamî" wek talûkeyek dinirxîn.

Helbet, dema mirov PR'ê bi partiye din ên burjûwa re dide ber hev, serkeftina wê diyar dibe. Ji ber ku rayen wî li gor hilbijartina sala çûyi %40 zêdê bûne, rayen partiye din ên burjûwa ji, bêrevajîyê PR'ê, pirr kêm bûne.

Ev rewşa li jor, aliyeke vê hilbijartîne ye. Bes aliyeke wê yê din heye ku pirr girîng e û bi zanebûn behsa wê nayê kirin. Ev aliye, ji sedî çend besdarbûna hilbijartîne ye.

Weke tê zanîn, li Tirkîye bi giştî besdarbûna gel a hilbijartina heta niha ne kêmî %80 bû. Bes di vê hilbijartina dawî de kesê besdarvan %60 bûn.

Ev jî rewşekê nû ye ji bo Tirkîye. Ev raste rast iflaskirina hemû patiyen burjûwa ye. Ji sedî 60 besdarbûna hilbijartîne bi xwe re %40 nebesdarbûn û nerazibû.



Serokê RP'ê Erbakan

na raya giştî tîne. Ev tê wê maneyê ku %40 û raya giştî li dijî vê sistemê ye. Ev tê vê maneyê ku ger partiyekî li dijî vê sisteme kapitalist hebûya û bi serbestî besdarî hilbijartîne bûbûya, wê kar bikira.

Her çiqas di 1'ê Mijdarê de Partiya Keda Gel (HEP) û Partiya Karkeran (IP) wek alternatifen partiyen burjûwa besdarî hilbijartîne bûnê ji, ji ber bêşîmkaniyê nikaribûn xwe baş bidin naskirin. Partiya Karkeran ji kesî bi xwe nedâ bawerkirin. Ji ber ku xebatêne wê edî zehf li ser rexnekirina Partiya Keda Gel (HEP) bûn.

Bi kurtî, serfirazên vê hilbijartîne, ne Erbakan, ne ji Demirel bû. Ger serfirazek hebe, ew jî yen %40 ên ku 30 hézar pere ji çavê xwe deranîn û besdarî hilbijartîne nebûnîne.

# Der heqê êrîşa PDK û YNK'ê de ronakbîrê Kurd ci difikirin?



Selim Çürükkaya

*"Ez mintiqâ ra xeberi  
timû gêno, Kurde Iraqê  
nêwazeni,  
yê zanî PKK ha  
semêdê çinay  
herb kena.  
Zaf hol zonî.  
Ey ra heti  
Telabanî û heti  
Berzanî nêgenî.  
Feqet Telabanî û  
Berzanî Tirkîya ra vanî,  
"bew ma hey herb kenî.  
Yardim bidê ma."*



Mistefa Reşid

*"Li gor bir û baweriya min  
ev tewandariyeke zor  
(pirr), zor mezin e.  
Ji ber ku wan hêzên xwefi-  
roş, planê împeryalizmê bi  
cih anîn û bi alîkariya  
artêsa Tirk êrîş  
anîne ser hêzên  
şoreşgerên gelê me.  
Divê her Kurdeki  
niştimanperwer,  
welatîz û her Kurdeki  
pak vê êrîşê  
mehkûm bike."*

## J. Espar

"Ez gava ji mala bavê xwe derketim emrê min bîst sal bû, emrê min bû pênci û pênc, ez vegeyiyam mala bavê xwe. Ez her di xebata Kurdayeti de bûm. Min sond xwaribû mal û can nîn e, Kurdistan heye bes. Di sala 1958 an de, ez bûm endamê PDK' a Iraqla. Û ez sê caran hatim girtin. Careki Se-dam hukmê idama min da. Du salan ji li Qesrî Nihayê (zindanekî ye, J.E.) mam. Lê ev tişt ez neêşandim. Şeş salan ji, me Kurdan di nav xwe de ser kir. Caş li a-liyekî pêşmerge li aliyekî. Caran cema'eta Telabanî li aliyekî em (qest PDK ye) li aliyekî. Şerê deve-rekê bû, ne şerê Başûr û Bakur bû. Şerê Başûr û Bakur şermeke mezin e ji me re. Iro ser e. Û partiya min a ku ez 35 sal tê de xebitime iro bûye hevalê dijminê Kurd û Kur-distanê."

Belê, ev gotinê jorin, ên Mamoste Mehmet Dewran in. Mamoste Dewran tevî Panela li ser êrîşa YNK û PDK'ê bû. panel li derê rojava fermî ya konferansa YRWK'ê ya yekêmîn bû. Li ser daxwaza beşdarên konferansê, birêvebirê konferansê panelêkê wiha amade kîribûn. Li gel Mamoste Mehmet Dewran, Av. Serhat Bucak, Zimanîn Musa Kaval û Şair Gundî ji beşdarî panelê bûbûn. Mamoste Mirhem ji pa-nelî idare dikir.

Mamoste Mehmet Dewran, behsa diroka têkiliyên tevgera Başûr û hikümetên Iraqla dikir. Ew, Mesûd Berzanî û Celal Telabanî ji pîr ji nêz ve dinase. Lewma di axâftina xwe de gelek behsa wan di-kir. Behsa Ubeydulla Berzanî ji dikir. Guhdarê panelê bi baldariye-ke mezin li Mamoste Dewran guhdarî dikir. Mamoste Dewran, di van 35 salan de, bûye şahîde ge-lek bûyer û serêşyan.

"Kuştina Kurd bi Kurd, li Iraqla tişteklî normal û adî ye. Gundiyek, gundiyê xwe kuştîye, pismamek, pismamê xwe kuştîye. Yek dibû caş, di caşî de dizi dikir, direviya

diçû li gel Celal Telabanî. Li gel Telabanî karekî pîs dikir, direviya cem me (mebest, PDK ye). Ê me direviya diçû cem Telabanî. Rew-şike wiha li Kurdistanî Iraqla çebûye, kuştina Kurd bi Kurd ne giran e."

Di dawîya axaftina xwe de, Dewran dikî: "Em razî bin an nebin, plana dijmin bi ser ket û şer dest pê kir. Pêşmergeyê ku 20-30 salî ji bo Kurdistanî şer kiriye, ni-ha xwîna birayê xwe dirîjîne. Xwîna ku di herdu aliyan de ji dirije, xwîna me ye. Em divê vî şerî sar bikin. Ne xema dijminen mene. Em Kurd vî şerî rawestînin. Şer ra-weste Kurdistanî me feyde dibînin, netewa me feyde dibîne."

Av. Serhat Bucak li ser karek-terâ vî şerî han ditinê xwe wilo-tine zîmîn: "Tê pîrsin: Ev şer ci şer e, ev şer di navbera kîjan hêzan de ye? Ez dibêjîm iro di vî şerî de, aliyekî gelê Kurd e; li aliye din ji, împerialist, kolonyalist û nokerê wan hene. Heger bikarîbin gerî-layê ARGK'ê ji wê derxin, dê di-şûna wan de leşkerê Tirk bi cih be û ji xwe re "mintikayeke tampon" çêke."

Şair Gundî, bi pirsekî dest bi axâftina xwe kir: "Van serokan ev 30 sal e, ci daye mîletê Kurd? Di warê siyasi de ci dane mîlet? Ma gotin "em netewe ne", gotin "ew şinorênu ku bi destê dijmin hatine danîn divê em rakin?" Na. Çaxa ku digotin em Kurd in, netewe ne, ji mecbûriyetê bû. Bi rastî xebat ji bo rakirina van şinoran çenebû.

Em werin warê leşkerî: Me dît, wexta ku PKK dest pê kir, piştî sa-lekî du sal, gotin akademî çekirine. Wexta ku min ew xebet bihîst, min got: "Ev tevgerê teze ye, nûjen e." Li Kurdistanî Iraqla 50 hezar pêşmerge çebûn, me tu ca-ran navê akademî nebihîst. Me ne-bîhîst xwendegêhîn leşkerî yan ji tiştîn wiha çebûn. Pêşmerge çekê xwe radikir, şer dikir. Tu tişt şerî mîletê xwe nekirin.

Em werin ser warê çandî û xwendewarî: Di vî warî de hin tişt çebûn bes kî kirin? Mirovîn me

wekî Kek Mehmed di bîst saliya xwe de çûye ketiye wan deran û hin tiştan kirin. Lê Berzanî û za-rokên Berzanî ne bi xwe fîr bûn û ne ji hiştin xelk fîr bibe."

Zimanîn Musa Kaval: "Roja ku Demirel hatîye ser hikûm bi her awayê dixwaze, şerî azadiye Kurdistanî bitemirîne. Lê şerî me ne şerekî feodalî ye ku mirov sero-kekî bikuje, an ji sed û dused pêşmergeyên baş bikuje û şer bîfe-tisîne. Ji ber wî ji, dijmin taktîta "kelê ji hundir ve îşxal bike" bi kar-tîne. Pêşmergeyan derdixe pêşya gerîlayen PKK'ê. Armanceke din ji heye, ew ji ev e: Dijmin dixwaze di navbera Kurdistanî Başûr û Bakur de, dîwarekî psîkolojîk ava bike. Û ev dîwarê ku dijmin dixwaze ava bîke, ji dîwarê Berlinê ji mezintir be."

Piştî panelê me xwest, di warê êrîşa YNK û PDK'ê de gelek kurt be ji, ditin û baweriye çend ronakbîrê Kurd bigirin. Gelo beş-darê konferansa YRWK ci difiki-riñ? Ditinê wan ci ne? Kak Wir-ya, ji rojhilatê Kurdistanî ye, li Berlinê rojnamevaniye dixwîne. Bersiva pîrsa min wiha dide:

"Sedemîn vê êrîşê xuya ye. Iro li Kurdistanî du bîr û baweri hene: Yek ji wan bîr û baweriya Kurdistanî ye ú ya din ji, bîr û baweriya otonomî ye, an ji ne Kurdistanî ye. Hêzên ne Kurdistanî bi dijmin re dibin yek û êrîşî hêzên Kurdistanî dikin. Plana vê êrîşê, hêzên împre-yalist û kolonyalist amade kirine û ew hêzên otonomîst ji parçeyekî vê planê ne."

Evuqat û Dirokzan E. Xem-gîn ji, li diji PKK'ê hevkariya Tirk û împerialistin tîne zîman û wiha dom dike.

"Weki alternatifâ dawî, dijmin dixwaze şer bike şerî nava Kurdistan. Ji bo vê yekê ji hêzên Başûr bi kar-tîne. Di vî şerî de, li aliye hêzên împerialist, kolonyalist û hêzên Başûr; li aliye din ji PKK heye. Ni-ha hêzên anti-împerialist û anti-kolonyalist li diji împerialist û kolonyalistin şer dikin."

Der heqê encamên vê êrîşa han

de, Timur Sayan (Li Sorbonnê li ser diroka Kurd teza doktoriyê a-made dike) ji me re wiha dibêje:

"Mirov dikare bîbêje, prestijî Tirkân şikîya. Di warê psîkolojîk de moralê mîletê me çû jor, edî Ewrûpa û dinya ji dizane kes nikare tevgera me ya jo bo serxwebûnê bişikîne. Qiyimet û itîbara serokatiya me Kurdan zêde bû."

Li gor nişkar Mistefa Reşid ji, ev êrîşen han tewandariyeke mezin e. Kek Mistefa dikî: "Li gor bir û baweriya min ev tewandariyeke zor (pirr), zor mezin e. Ji ber ku wan hêzên xwefi-ros, planê împerializmê bi cih anîn û bi alîkariya artêsa Tirk êrîş anîne ser hêzên şoreşgerên gelê me. Divê her Kurdeki niştimanperwer, we-latîz û her Kurdeki pak vê êrîşê mehkûm bike."

Ez ji Dr. Tewfik Hemdoş di-pîsim: Çaxa ku te ev êrîşa PDK û YNK'ê bihîst te ci hisî kir û tu ci fi-kiri?

"Ez pîr pê eşiyam. Û bi rastî ji ev êrîşa ku Telabanî û Berzanî birîye ser pêşmergeyên ARGK'ê ne tiştîkî ye, ku di carekê de hate meydânê, me dizanibû, ew kengê bibe, wê wî karî bikin. Ev êrîş vê yekê ji dide xuyakîrin, insanê xâ-yîn, edetê xwe ber nade.

Lê gelê me yê Başûr baweriya xwe bi Berzanî û Telabanî girê da û em dibînin wan ji nehişt gelê me bihostekî bi pêş keve. Wan gelê me bir û bi dijminan ve girê da. Bi rastî, ji Kurdan re eyb û şermekê pîr mezin e ku li dû wan herin."

Mamosta Dilan bi hevaleke xwe ya din re, di konferansê de jînê ronakbîr temsîl dike. Lê, min li ser êrîşan ditinê Mamoste Dilan pîrsi. Mamosteyâ hêja wiha digot: "Niha Berzanî û Telabanî behsa riyan dikin, behsa şinoran dikin; dibêjin: "PKK riyan me qut dike, nahêle xwarîn ji me re were." Ma nayê bîra me? Ji bo ci êrîş birin ser Kurdistanî PDK' a Iranê? Û ez bawer im bi sedan pêşmerge ji wan kuş-tin. Niha ez, ji yên ku xwe serok dihesibînin, welatparê dihesibînin û xwe Kurd dihesibînin re dipir-

sim: Wijdan li ba we tune ye, lê hûn ji tarîxê ji şerm nakin? Sibê hûnê çawa bersiva tarîx û nifşen were bidin?"

Nivîskar M. Selim Çürükkaya bersiva pîrsen me bi zaravâyê Zazakî dide û em ji ditinê wî, bi vê zarava xwe ya şerîn dinivîsinin. Çürükkaya bi gera Telabanî û Berzanî dest bi qisekirina xwe dike û dibêje:

"Celal Telabanî û Mesûd verê omeybî Ankara, üja ra pey şî Amerîqa üja ra pey hewna omey Ankara. Turgut Ozal û Suleyman Demirel yînî ra va" şerî üja ver a (qarşî) PKK herb bikirê, ma zi yardım donî şima. Yê zî şî û est kampanê PKK ser. Yew heta yê hey donî pîro, yew heta zî dewletay Tirkân don pîro. Wirdî piya eksera ver a PKK herb kenî."

Ez Selim Xocay persona û vana, ebi gore bê bawereyde to Kurde Iraqla se vanî û reksiyonê yînî ci yî? Selim Xoca vano: "Ez mintiqâ ra xeberi timû gêno, Kurde Iraqê nêwazeni, yê zanî PKK ha semedê çinay herb kena. Zaf hol zonî. Ey ra heti Telabanî û heti Berzanî nêgenî. Feqet Telabanî û Berzanî Tirkîya ra vanî, "bew ma hey herb keni. Yardim bidê ma." Mesela ay rojî Mesudi va: "Yaşasın Tirkîya, kahrolsun PKK!" Telabanî û Mesûd inkey hema hema bi "pawitoxê dewan" (köy korucusu). Di hebi Tahir Adiyamanî bi ziyêdi. Hetanî inkey, tewir ver a Tahir Adiyaman ci qaydebi inkey ra pey ver a inênan zî in qayde benû. Tarîxdê ma Kurdan yew çiyo zaf muhim esto: İxanîti gironey ma ve-renêdawo. La belê inhew Kurdi bi organize yî, Kurdi zanî hey se ke-nî. İnhew ma gironey yînî ve-renêdonî."

Jêrenot: Feqî Huseyn Sagnîc ji beşdarî panelê bûbû. Ü gelek dî-tinê bi qiyemet pêşkêşê beşdaran kiribû. Lê, ji ber hin kêmasyen teknikî, em nikaribûn beşekî ji a-xaftina Serhat Bucak û axaftina Feqî Huseyn a bi nîrx istîfâde bikin. Em dêwa lêborîn ji Mamoste Feqî Huseyn dikin.



Yek, dudo hêjî bêhtir Viyetnam.

Ernesto Che Guevara

# Li hêviya UFO'yan in

Mirovê reben gava ku dibû şev, nîvê şevê radibû dicû nav bexçeyê xwe, herdu destê xwe radikir hewa û diqîrî "Werin ez li vir im, werin min bibin herin cem xwe, ez li vir im!..."

Şeva tarî çawa dibû tavehîv ew dengê bilind tê guhê maleke nêzîkî wê derê. Ev mirov, çend sal berê, cîranê mala hevalekî min bû. Navê wî Qudret bû. Qudret di xaniyekî kevnare de rûdinişt. Ev mal ewqas kevin bû kû hema hemma hildiweşîya. Wê dewlet ew ji wê mala kevin jî derxista. Karê Qudret bekçitiya şevê bû. Bekçiyê "Saha xalî" ya sporê bû. Diya wî 50 salî bû, bi zilamekî 100 salî re zewicibû, xaniyekî wî zilamê hebû. Diya Qudret, birayê wî û ew li hêviya mirina kalê sed salî bûn. Dema ku kal bimira, wê Qudret bizewiciya. Planê zewaca Qudret li ser mirina kalê sed salî hatibû avakirin. Lî hetta niha çend sal di ser planêwan re derbas bûye, kalo hê ji ne miriye, çiqas diçe çêtir di-be. Li ser vê, Qudret bêkar maye.

Qudretê reben bawer dike ku wê rojek were, UFO wî bibe here here cem xwe. Ji ber vê yekê, Qudret gazî UFO'yan dike. Ez rûniştüm û li ser vê bûyerê fikirîm. Min ji xwe re biryar da ku Qudret ne neheq


bû. Li vê dinê tu tam nemaye. Êdî tu baweriya wî bi vê dinê nemaye, li hêviya UFO'yan e.

Her tişt li aliye kî, bi rastî jî iro civaka Tirk, ji jiyana xwe hez nake û ketiye xewn û xeyalan. Qudret jî carna limê dikir, rojî digirt. Lî gava ku dibû tavehîv qet gaziya xwe kêm nedikir. Ev xewn û xeyalén wî, di jiyana wî de, ne ji bo xemilandina xewa wî bû. Ev tişt tim û tim di jiyana wî de cih girtibû. Iro gel zehf bi hêrs e. Ji tiştêkî pirr biçûk re jî tehamûl nake, diqehire. Civaka Tirk di aliye sosyo-psikolo-

jîyê de gelek guheriye. Civaka Kurdan ji aliye aborî ve pîrjar e. Lî gelê me ji dema pêşîya xwe, ji hatina xwe bawer e. Çend sal berê, ev roj û ev dem ji bo gel xewn bû.

Iro Demirel dibêje: "Bila kesek parçekirina Tirkîyê xeyal neke. Xîçîkî Tirkîyê tune ku bide kesekî." Em jî dibêjin ku ne xîçîkî, em Kurdistanê tev gava hildin em ji Demirel pirs nakin. Gava ku Demirel şewqa xwe hilde bireve, eger cîhekî revê nebîne, wê gazî UFO'yan bike.

Kulinka Hezaran



# Çiroka min û 'kak'

Tê bîra min ez fêri adetekî pirr ne baş bûbûm. Her êvar ezê bihatama malê û minê xwe li sir dev bavétana erdê, min bangî diya xwe dikir ji bo ku bê pişa min bixwirîne. Ne rojek û ne dido, bi salan dirêj kir. Diya min jî dilê min nedîhişt, pişa min dixwirand. Rojekê diya min ji gund derket û çû bajêr, nêzîkî heftiyekî ma. Çend rojén pêşî xwişka min pişa min dixwirand, lê jê û şûn ve qeramûş û napirok di danê ji bo ku ez nema ban wê bikim. Êdî ez bûme weke berixkê gurrî, vir de hatim wê de çûm, min pişa xwe bi diwanan dixwirand. Şevekê em hemû li dora sobê rûniştibûn,

min dît ku diya min kete derî, wek ku çûkek ji ser dilê min firiya, min xwe çeng kirê û herdu hinarekê rûyê we maçî kir. Min nema xwe girt û min pê re got: Iro çend rojén te ne tu né li vir i, pişa min gurri bûye, kesî nedixwirand û hema min pişa xwe tazî kir. Hetta jê hat tepek li pişa min xist, yek ji li nav serê min xist û wiha gote min: Tê bîra min rehmetiya pîrika min digot, eger mirov xwira xwe ne bi destê xwe bişkîne, çare lê na-be. Here bi cehneme tu pişa xwe bixwirîne!

Ji wê rojê û şûn ve ez bûm mîna beranekî, nema min ban kesî kir û min bi xwe pişt û

serê xwe dixwirand.

Vê rojê ji "Kak" vir de baz dide, wê de baz dide, pişa xwe na wele zikê xwe ji, tazî dike û dide ber nehperûşkên guran. Eman ez di bextê we de me, em gurri bûne. Nabêje ez gurri bûme, dibêje "em" ..! Bê çawa yê min dê bû tep li min da nema pişa min xwi-rand, wiha ji jînbava Kak tepe li serê Kak dixe, lê yê min, min fedî kir û ez li ber xwe ketim, ê wî, ew li ber xwe ji nakeve tew dibêje. Oooof..çiqas tiliyen te nermin, mîna hevrîsim in. Hey Xwedê bextik li te qulaptô, tu cara mirov ji neperûşkan re gotiye tilî?

H. Sefkan

# TÎR

Musa Anter



## Roşinbîrî rasteqîne debê wek Musa Anter bê!

(SORANI)

Wek dezanîn her gelêk le çend çîn û twêjî ciya ciya pêk dêt. Roşinbîrânî kertêkî karîger û be twanay her komelgayekin. Ewanin ke erke here qurrsekanîyan dekewête esto û leserişyan pêwîst e be zûtirîn kat erkekanî ser şanî xoyan raperrênen. Le mêjûda gelê nimûney berçaw hen leser rolî rûnakbîran le şorişe azadîxwaziyekanî gelanî çesawey cîhanda. Aya kesêk heye Gorkî û romankey "Dayik"î nebîstbê?! Nimûne gelê zorin û lem baseda cêyan nabêtewê.

Le ser roşinbîr pêwîst e bo teniya çirkeyekîş le daway reway milletekey danebrîrê û lêy xafil nebêt. Debê hemîse mukirr bê le ser aşkîra kirdinî rastiyekan û roşin kirdineyey rîga leberdem role lêqewmawekanî gelta.

**Le ser roşinbîr pêwîst e bo teniya çirkeyekîş le daway reway milletekey danebrîrê û lêy xafil nebêt. Debê hemîse mukirr bê le ser aşkîra kirdinî rastiyekan û roşin kirdineyey rîga leberdem role lêqewmawekanî gelta.**

wa karubar û erkekan çend qat zêdetir debin, çunke gelêkî sî milyonî gewre û giran taku êstaş le sadetirîn maf bêbeşe. Belê taku emros maffi ji yanışman pê rewa nabînin. Leber ewe rûnakbîranî Kurd debê bibne meşxelî rûnak kirdineyey tarîkî û penhaniyekanî jiyan. Hengawanî ewan debê wabeste bêt be şorişî niwêy rizgarîxwazî gelekmân.

Kem kes hene nawî "Musa Anter" yan nebîstibê. Musa Anterî rojnameger û nûser û zana û şorîşgêrrî pênuş le dest her le serdemî lawêtiye-we be nûkî xame tîjekey begij dagîrkeranî wilatekeyda çotewe û heta diwa henasey temenîşî serî bo faşîstan şorr nekird. Şehîdî 76 sale û serqafeçi karwanî rewapanakanî Kurdistan be şehîdbûnî xoy riq û nefretî pîrozî le nêw dil û derûnî, her Kurdperwerêk û niştimanperwerêka dirust kird.

Musa Anter to nemamî azadî taze pişkutûy Kurdistanî!

To estêregeşey berbeyan û tirîfey mangeşewî Kurdistanî!

Swênd û peyman be xame pîrozekey destî to! Heta mawîn degrîne ber rîga û karwanî berzî to!

**Mehabad Kurdi**

Têbinî: Gelek nivîskar û xwendevan li ser Apê Musa nivîsan dişînîn. Her hefteyê em yekê ji wan diweşînîn. Nivîsên ku heta niha nehatine weşandin, di demeke kurt de bi dorê emê wan di vi stûnî de biweşînîn.

Hilbijartina Meclîsa Neteweyî li Kurdistanê, Tirkîyê û gelek welatên Ewrûpa di 20-22 yê Mijdarê de çêdibe.

# Ji bo welitekî serbixwe

Ev demeke dirêj e ku amadeka-riyên hilbijartina Meclîsa Neteweyî didomin. Dê hilbijartin li welat û Ewrûpa pêk were. Niha li gelek bajarên Ewrûpa pêvajoya hilbijartinê dest pê kiriye. Nûçevanê me yê Swêdê der heqê hilbijartina li Swêdê nivisî. Em li jêr vê nûçeyê diweşinîn.

Di 31.10.1992 an de li Stokholmê, li xaniyê Medborgarhusetê civinek li dar ket. Belê, civinek bû, lê ne ji wan civinê adetî.

Di dîroka me Kurdan de, ci-vinê wilo cara yekemîn e, çê dibin. Bê guman ci-vinê gelek de-rengmayî ne. Li Atinayê çend he-zar sal beriya me çê bûne. Tiştên ku em iro munaqeşe dikan, xelkê zû ve ji bir kiriye.

"Em dereng mane." Ev gotin bi çend caran di vê ci-vinê de hate tekrarkirin. Divê em 'bilezînin. Panzehîra "derengmayînê" lezan-dine. Divê em bilezînin ku bi-gihêjin xelkê. Hilbijartin ji bo Meclîsa Neteweyî, di vî warî de serkeftin, kurt û kêmkirina menzîla di navbera me û gelên cihanê de ye.

Civîna Stokholmê, yek ji ci-vinê hilbijartin ên "Meclîsa Neteweyî" bû. Meclîsa Neteweyî, ku di hemû besen Kurdistanê de, wê irada gelê Kurd temsîl bike. Meclîsa Neteweyî, ku wê bibe pêşewa neteweşa Kurd, Meclîsa Neteweyî, ku wê bibe organa herî bilind a neteweşa Kurd û Kurdistaniyan. Meclîsa Neteweyî ku wê bibe bingeha dewleta Kurdistana pêşeroj. Û Meclîsa Neteweyî ku wê bibe dest-pêka jiyan demokrasiyê, di cikava Kurd de.

Komîsyona Hilbijartina Herêma



Hilbijartina endamên Meclîsa Neteweyî ya serbixwe ku hêza xwe ji têkoşîna partiya gelê xwe distîne cara yekemîn e ku di dîroka Kurd û Kurdistanê de li dar dikeve.

Swêdê li dîwanê cihê xwe digire. Ci-vîn bi marşa "Ey Reqîb" vedibe.

Serokê komîsyonê di axaftina xwe de, di dîroka Kurdistanê ya nûjen de, behsa sê qonaxê tarîxi dike. 1-Damezirandina PKK'ê. 2-Dest pê kirina şerê çekdarî. 3-Ji bo avakirina Meclîsa Neteweyî dest pê kirina xebatê. Erk û wezifeyen welatperwerî ya dema me, pêşberî besdarîn ci-vinê dike. Dû re li ser vê mijarê xelk dest bi munaqeşeyan dike. Pirs têne kirin.

## Jİ BO KURDÎN EWRÛPA

### 10 PARLEMENTER

Li ser erk û wezifeyen Meclîsa, qâide û esasên meşandina hilbijartina dibe xala duyemîn a ci-vinê.

Li Ewrûpa, hilbijartina giştî ji bo Meclîsa Neteweyî wê di navbera 20, 21, 22/11/1992 an de pêk bê. Anglo di van sê rojan de hem-welatiyê me, dikarin herin dengê xwe bidin. Li her welatê Ewrûpa, Komîsyona Hilbijartina Herêma heyne. Ji hemû pirs û pirsgirêkên hilbijartînê herêman, wê ev Komîsyona berpirsiyar bin. Ji bo hemû

Ewrûpa ji, Komîsyona Hilbijartina Ewrûpa heye. Ew Komîsyona han, heta dawiya hilbijartina ji hemû kar û barê hilbijartina Ewrûpa, berpirsiyar e.

Hilbijartin wê du merhale bin. Gavê pêşin wê xelk nûnerên xwe hilbijêre. Ev nûner ji, di nava xwe de, parlementeran hildibijérin. Endamê Komîsyona Hilbijartina Herêma Swêdê Fîrat, ji bo vê yekê minakan dide û dibêje:

- Li hemû Ewrûpa wê 153 nûner ji aliye xelkê ve bênil hilbijartin.

Ev 153 nûner ji, di 5,6/12/1992 an de, wê di Konferansa Ewrûpayê de, ji nav xwe 10 parlementeran hilbijérin. Ev deh parlementer di Meclîsa Neteweyî de, me Kurdîn Ewrûpayê temsîl dikan.

Li Swêdê em dê 5 nûneran hilbijérin. Ev 5 nûner wê li Konferansa Ewrûpayê, Kurdîn Swêdê temsîl bikin.

Hevalê Fîrat, paşê li ser kar û barê hilbijartînê yê Swêdê radiwes-te û dibêje:

- Kurdîn Swêdê wê di yanzdeh (11) sindoqan de, dengê (rayê) xwe bidin. Dê ji wan sindoqan sê heb li Stokholmê bin. Ê mayîn ji, li bajaren din. Helbet em bajaren wek Göteborg, Uppsala, Eskilstuna û yên din ku gelek Kurd lê dîmînîn, sindoqan deynin. Lî cihênu ku Kurd lê kêm in, em li wan deran ji, sindoqan bigerînîn, ku hemwela-tiyê me bikarîbin mafê xwe yê dengdanê bi kar bînin.

Hevalê Fîrat li ser teqwîma hilbijartînê, qa'deyen dengdayinê û şertîn berendamtiyê (namzetiyyê) ji, besdarîn ci-vinê agahdar dike:

- Kesên ku bixwazin bibin berendam, divê heta roja 3/11/1992 beriya saet 19.00 serî li Komîsyona Hilbijartina Herêma Swêdê bidin. Ji bo serîlêdan, divê formê mat-bû, ku me amade kirine, bêne bi-karanîn.

Berendam heta 19/11/1992, saet 19.00 bi her awayî dikarin propaganda xwe bikin.

Hemweliyê me yên ku 18 salî ne, dikarin dengê xwe bidin. Ji bo ku mirov bikaribe dengê xwe bide, mirov Kurd be an ji Kurdistani be bes e. Lî, ji bo ku mirov we-re hilbijartînê hin şertîn din ji he-ne. Kesên ku bikaribe xwe wekî berendam nîşan bide, divê 23 salî be. Divê li hember gelê xwe bi zane-bûn xiyanet nekiribe. Divê azadî û serxwebûnxwaz be. Pivan bi tenê ev in.

Dendgâyin wê nehîni (dizî) û jîmartina dengan wê eşkere be. Li ser her sindoqan ji bo rîk û pêkiya hilbijartîn, wê Komîsyona Sindo-qan hebe. Kesên ku bawer bike, Komîsyona Sindoqan şâşî an ji ne-heqî dike, dikare wan kesan ji Komîsyona Hilbijartina Herêmê re gi-lî bike.

Hinek ji berendamîn Meclîsa Neteweyî yê herêma Swêdê ev in: 1-Karwan Caf (Kerkuk) 2-Nûri A-minî (Urmiye) 3-Fahri Bozkurt (Konya) 4-Reşo Nergiz (Nîsebin) 5-Besîr Botanî (Zaxo) 6-Alî Aslan (Batman) 7-Mele Osman Algan (Mîdyad) 8-Seyîdxan Anter (Mîrdîn), Sebîr Akman-Emce (Şîrnex) 9-Mîrhem Yîgit (Mîrdîn) 10-Kanî Arat (Meraş) 11-Çeto Hasan (Meraş) 12-Reşid Bal (Kulu) 13-Seta Bakircîyan (Amed) 14-Ronî Canbek (Meraş) 15-Ne-vîn Rewsen (Lice) 16-Robin Rew-sen (Lice) 17-Ciya Sefkan (Kon-ya).

## Li hember xiyanetê ber bi yekîtiyê ve

Berxwedana ku PKK li hember yekîtiya dagirker û xayînan dide, hem baweriya gelê Kurd pê zêde dike hem ji firseta jihevcudakirina dost û dijminan dide gelê Kurd.

Ji vêga ve zehfîn pêşmergeyên YNK'ê bi çewtiya ku ketine navê, hisiyane. Wekî din hejmarek kesen din ên ku di nav Cepha Kurdistanê de cih digirin ji, bi ser hişê xwe ve têr û dixwazin xwe ji nav lepên împeryalîzmê xelas bikin.

Hîna bêyî ku ev şer dest pê bîke, Serokatiya PKK'ê gelek caran ji wan re digot: "Hûn têkiliyên xwe bi Komara Tirk û împeryalîzmê re zêde bikin, hûnê têkevin nav îxanetê. Her çiqas iro împeryalîzm ji rûyê we re dikene ji,

ger fersend bibîne wê we ji ji holê rake, ji ber ku împeryalîzm û dewleta Tirk ne ji bo berjewen-diyan xwe bin, xwe nêzîkî bavê xwe ji nakin."

Îro, pêşmergeyên PDK'ê hê ji vê îxanetê bernedane lê pêşmergeyên YNK'ê û hin hêzên ku pariyek welatparêzî di dilê wan de heye, vê îxaneta Berzanî û işgal-waziya ordiya Tirk dibînin û xwe ji vê rewşê dixwazin xelas bikin.

Ger YNK û hin hêzên Cepha Kurdistanî, xwe bi temamî ji xayînan nav xwe xelas bikin, dibe ku yekîtiyeke xurt di navbera hemû hêzên welatparêz de çêbibe û li diji dewleta Tirk û xayînan têkoşîneke hîn xurttir li dar bîke-ve.

### MECLİSA NETEWEYİ

Di 20-22'ê meha Mijdarê de li hemû deverên Kurdistanê, li Ewrûpa û li bajaren Tirkîyê yên Kurd lê dijîn wê hilbijartina me-bûsen Meclîsa Neteweyî çêbibe. Ev hilbijartin gaveke dirokî ye, ji bo gelê Kurd. Di dawiya hilbijartînê de wê meclîseke serbixwe bê damezirandin. Girîngiya damezrandina vê meclîse pirr mezîn e.

Ev meclîs wê bi destê gelê Kurd û ku baweriya xwe bi têkoşîna PKK'ê aniye, bê damezirandin.

Ev, divê wek berhema têkoşîna çekdarî ya PKK'ê bê nirxandin. Ji bo welitekî azad bi hilbijartina endamîn Meclîsa Neteweyî ya serbixwe ve!

# Pêşmerge û leşkerê rom bi hev re ne

**Navenda Nûçeyan-** Ketina hezên leşkerî yên dewleta Tirk nav başûrê Kurdistanê, pêşî bi alîkarî û rêberiya pêşmergeyêن.

PDK û YNK'ê hêviya tunekirina gerilayêن ARGK'ê da ordiya Tirk û xayînên Kurd. Îsgalkirina başûrê Kurdistanê, ne tenê ji aliyê xayînên Kurd ve hate destekkirin; ev işgal ji aliyê dewletên împerialist ve ji, nemaze ji aliyê Dewletêن Yekbûyî yên Amerika ve bi këfxweşî hâte pêşwazikirin. Êdi bi temamî, derdikete holê ku dewleta Tirk berî ku leşkerên xwe bajo nav başûrê Kurdistanê, riza û qebûla Amerika û dewletên Ewrûpî standibû. Gelo çima ev hêzên împerialist û feodal giş di vê işgal de yekîti çekiribûn? Di problemêن herî girîng de ji tu car, bili hemû dijberiyêن navbera xwe, tev li ser işgalkirina başûrê Kurdistanê bûne hemfikir. Ji kîjan aliyî ve mirov li vê rewse binêre û binirxîne, sebeba herî girîng ji bo yekîtiya van hêzan, tîrsa PKK'ê ye. Ji ber ku hebûna PKK'ê û di ser re ji roj bi roj pêldan û şaxdana hêzên PKK'ê mutefik û hevalbendê împerializmê, yên feodal û paşverû û xwesipar qels dike û rûyê wan ê xwefiroş li nik gelê Kurd derdixe holê. Rêxistin û dewletên bi navika xwe ve bi împerializmê ve girêdayî ne, bi xurtbûna hêza serbixwe û sosyalist a PKK'ê, ber bi pelişandinê ve diçin û rola xwe ya cendermetiya împerializmê nikarin pêk bînin. Ev ji tengasiyêن mezin derdi-

xin pêşıya împerializmê û rê li pêşıya berjewendiyê wan ên kedxwarî, yên li Rojhilata Navîn, digirin.

Bi kurtî, xurtbûn û dorfirahbûna PKK'ê ev hêzên paşverû û dijminê mirovahiyê giş kirin yet li ser işgalkirina Başûr. Helbet ev, tenê, aliye kî plana împerializmê bû. Ger ev işgal bigihîta armanca xwe, wê dest bi operasyonê bakûrê Kurdistanê kiribana.

Lê vê işgalâ ku hemû împerialist û feodal hêviya xwe pê ve girê dabû, hîna di dest-pêkê de, da diyarkirin ku, tunekirina PKK'ê wisa ne hêsan e. Di ser vê işgalê re mehek derbas bû, hêviya tunekirina gerilayêن ARGK'ê, di pêşira dewleta Tirk û hevalbendê wê de ma. Iro ordiya Tirk, roj bi roj ber bi têkçûnê ve diçe. Ev rewş ji hêla alîgirên Tirkîyê ve ji tê dîtin û ji niha ve, nemem-nûnbûna xwe pêşkêşî dewleta Tirk dîkin. Her çiqas hê ji împerialist desteka xwe jê nebîrribin ji, hêviya xwe ji serkeftina ordiya Tirkîyê birrîne.

Li aliyê din YNK ji, hêdî hêdî bi çewtiya xwe ya dîrokî dihise û nexweşîya xwe li dijî dewleta Tirk dide xuya kirin. Pêşmergeyêن YNK'ê ji bo xwe ji vê çewtiya dîrokî xelas bikin, amadekariya lihevhatina bi PKK'ê re dîkin û ji niha ve, şerê ku li dijî ARGK'ê dimeşandin, sekinandine.

Xuya ye ku hêzên YNK'ê têgîhîstîne, ku iro Komara Tirk û împerializm, PKK'ê ji holê



Li bakurê Kurdistan cerdevan, li başûrê Kurdistan ji pêşmergeyê PDK'ê, xulamî û rêberiya leşkerên Rom dîkin. Gelo ev pêşmergeyê me ji nizanîn ku ji destê leşkerên Rom were, wê koka gelê Kurd biqelinin?

rakin, wê sibê dor were wan. Pê hisiyan ku ger iro Komara Tirk xwe nêzîkî wan dike, ev ji ber hebûna PKK'ê ye. Yanê ger PKK nebûya, kesî ew hesab nedikirin.

Her çiqas YNK dixwaze xwe ji vê çewtiye paqîj bike ji, hevalbendê wî PDK, İxaneta xwe ya navdar her dom dike. Pêşmergeyê PDK'ê, wek cerdevanan rêberiya ordiya Tirk dîkin.

Li ser rewşa başûrê Kurdistanê, Partiya Karkeren Kurdistanê daxuyaniyek belav kir. Tê

de bi kurtî vê rewse wiha şirove dike. "Di van demêñ dawî de çapemeniya împerialist û burjûwa, rastiyan berevajî dike. Dibêje ku PKK teslimê pêşmergeyê bûye. Ev giş derew in. Ew nûçe, tenê xeyala dewleta Tirk û hevkarên wê tînin ziman.

Berxwedana PKK'ê ya ji bist salan ve dom dike, bi hemû kesî daye zanîn ku, PKK bi tu awayî xwe naspêre tu kesî. Ne gelê me, ne ji raya giştî ya dinayê, ji wan nûçeyen derew bawer nakin. Armanca dewleta

Tirk ew e ku, bi nûçeyen drew, baweriya gelê me bi PKK'ê qels bike û rê li pêşıya têkoşîna me ya ku li bakurê Kurdistanê bilind dibe û rewşa Komara Tirk xerab dike, bigire.

Heta niha, li başûrê Kurdistanê Komara Tirk, ji îmhakirina balefir û helikopteran bigirin ta telefsirina bi sedan leşkeran, derbêñ pîr xedar. Komara Tirk, wê bi tu awayî nikaribe ji nav vê ritama ku ketiyê, xwe xelas bike."


## Serokê PKK'ê Öcalan: 'Gelê Başûr ber bi têkoşîna me ve tê'

Rojnameya "Berxwedan" roja 4'ê Mijdarê bi Serokê Partiya Karkeren Kurdistanê, Abdülâh Öcalan re, hevpeyvînek li ser rewşa dawî ya şerê Başûr çêkir. Em gotinê Öcalan bi kurfi pêşkêşî we dîkin: "Dema xayînê Başûr, ketin tengasîyi, gazi ordiya Tirk kirin, dema ordiya Tirk ji nekarî tesîr li me bike, tanq û topên xwe bi ser me ve şandin, balefir û komandoyên xwe bi kar anîn. Lî dîsa ji nekarî tîstekî zêde bikin. Vêca dest bi derwan dîkin, dibêjin ku derbêñ mezin li gerîla xistine.

Lî idayêن wan giş vala ne. Mesela di nav van du rojêñ dawî de 2 gerilayênen me şehîd ketîne lê, ew dibêjin ku 20 gerîla kuştîne. Wekî dîsa berî du rojan 5 gerîla şehîd ketîn, wan got 40 gerîla hatine kuştîne.

Bi rastî, pêşmergeyê YNK'ê ji zêde ne bidil bûn di vî şerî de. Ji ber vê yekî, dest bi hevditînê lihevhatînê hate kirin. Di nav Cepha Kurdistanê de kesen welatparêz he-ne, em dixwazin bi wan re yekîtiye çêkin û xwefiroşen nav Cepha Kurdistanê derxin holê û rê li liştikên dîjimîn bigirin.

Hin kes dibêjin "PKK silahen xwe datine, xwe testîm dike." Ev, gotinê bê binî û bê e-



sil in.

Em wek berê dîsa, silah bi dest, li ser xwe ne û li ber xwe didin. Têkoşîna me ya qehremâni ji aliyê Kurden başûr ve ji hate dîtin, ji ber vê yekî, gelê me yê Başûr ji xwe bi aliyê me ve dîkîne. Bi vî awayî emê têkiliyîn pirr saxlem di nav Bakur û Başûr de bi pêş xin."

Berxwedana me ya vê meha dawî, wê di dîroka Kurdistanê de cîhekî pîr mezin bigire.

## Li Ixdirê êrişen faşîst

**Navenda Nûçeyan-** Li Ixdirê di meşâ ji bo protestokirina bûyeren başûrê Kurdistanê de, polis û faşîst bi hev re êrişî ser meşvanan kirin û li gor agahiyê heta niha gîhiştine me 2 kes hatine kuştîn, nêzîkî 15 kes ji birîndar bûne.

Ev qirkirina ku bi ferma waî û midûrê emniyeta Ixdirê pêk hat, rû-reşî û politikayên dewleta Tirk, a li hember gelê Kurd careke din eşkere kir. Bûyeren bi vî rengî yên qirkirina meşvanan, bi kuştina Wedat Aydin re dest pê kiribûn. Dewlet ji bo bi tirsandin û xofê rî li ber protestoyen gel bigire, êrişî besdarênen cenazê Wedat Aydin kiribû û bi dehan kes di vê bûyerê de hatibûn kuştîn. Dû re ji, gelek caran bi vî rengî êrişî ser gel kirin û gelek mirov di van bûyeran de, bi destê polis û leşkeran hatin kuştîn.

Li Ixdirê Azeriyê faşîst ji bi polisan re êrişî meşvanan kirin. Dewlet heta niha gelek caran, ji bo di nav

Kurdan û Azeriyan de şer derkeve li dû provakasyonan geriyabû, lê heta niha di vê daxwaza xwe de serfiraz nebûbû. Ji bo provakasyoneke wiha faşîstên ji partiya MÇP û yên ku ji xwe re dibêjin "Ülküçü", şirîkatiya polisan dikirin. Di vê bûyerê de, ev faşîstên devbixwîn ji raste rast gule reşandin ser protestovan. Meşâ ku ji alî Kurden Ixdirê çêbû, ji bo protestokirina ordiya Tirk bû. Gel bi vê meşê, dengê xwe bi gerilayen re kir yek û ordiyê protesto kir.

Ji der û dorê Ixdirê ji gelek mirov ji bo vê meşê civiyabûn. Pişti ku meş dest pê dike, çend kes ji Azeriyê faşîst û polis û leşker bi hev re gule direshîn ser meşvanan.

Heta niha, tevî yên ku di cenazeyan de hatine girtin, nêzîkî 500 kes xistine bin girtine. Polis nahêle gel cenazeyen xwe ji rake û êrişî van cenazeyan dike. Gelek mal û dikanen Kurden ji xera bûne.

Neteweyek pêwist e ku xwedî  
axeke yekparçe, dewleteke  
navendî, alfabe û zimaneye  
yekgirtî û xwedî yek alekê bc.  
Ev taybetî, sembol û nîşanên  
her neteweyê serbixwe û a-  
zad in.

Yekîtiya devok û zaravayê Kurdî, bi yekîtiya alfabe, rast-nivîsandin û gramera Kurdî ve girêdayî ye. Ango yekîtiya alfabeya Kurdî, pêngava yekemîn a zimanê Kurdî yê yekgirtî ye. Her netewe an ji gel yek alfabeyeke wî heye. Ango yek netewe û yek alfabe. Alfabeyên cuda yekîtiya devok-û zaravayan çenake. Berevajî wan ji hevûdu dûr dixe. Her zarava û devokekê ber bi zimanekî serbixwe ve dibe an ji, jê re alikarî dike. Gelek devok bi vê rê û metodê di nav proseseke (pêvajoyeke) dûr û dirêj de, bûn zimanê cuda yên serbixwe. Dagirkerên Kurdistanê ji, jix-we vî tiştî dixwazin û ji bo wê ji hewl didin. Lê, divê em hişyar û zana bin. Bi berpirsiyar û însiyatîvgir bin.

Îro divê û pêwist e ku berî her tiştî em alfabeşa Kurdî bikin yek. Niha li pêş zimanê Kurdî yê hevgirtî gelek kosp û astengên mezin û girîng hene. Ji wan kosp û astengên herî dijwar yek jî, alfabeşen Kurdî yên cur be cur in. Wek tê zanîn iro sê alfabeşen Kurdî yên cuda hene:

- 1- Alfabeysi Latinî
  - 2- Alfabeysi Erebî
  - 3- Alfabeysi Kîrîlî

Kurdên Bakur û Başûrê Rojava, alfabeşa Latinî, yêñ Rojhilat û Başûr alfabeşa Ere-bî û yêñ li Sovyeta kevin ji alfabeşa Kirîlî bi kar tînin. Hej-mara deng û tipêvan her sê alfabeşyan ji ne yek in. A Latinî ku ji aliyê Celadet Bedir-xan ve hatiye amadekirin ji 31 tipan pêk tê. A Kirîlî 40 û ya Erebi ji, ji 34-35 (ji ber ku Kurdên Soran li ser tipa “ö” li hevûdu nekirine) deng û tipan pêk tê. Neyebûn û neheygirtina hejmarêñ tipêñ alfabeşyêñ Kurdi, fonetiķa Kurdi xerab dike. Tonêñ deng têñ guhertin. Yekîtiya ton û fonetiķî namîne. Alfabeşyêñ pirrtip ne alfabeşyêñ modern û yêñ bikêrhatî ne. Alfabeşyêñ pirrtip di prosesa perwerdeyi de, bi xwe re ge-lek problem û sergêjiyan tînin. Alfabeşyêñ pedagojik û pratîk yêñ këmtip û sade ne.

Alfabeyên Kurdi yên cuda, wek tixûbêñ (sinorêñ) dagir-keran neteweya Kurd ji hevûdu cuda kirine û dikin. Per-  
duska reya wek zînî ñîx. X-

# Alfabe û zimanê yekgirtî


# A M E D T İ G R İ S

Di roja 24'ê meha Cotmeha 1992 an de, li Kurdistan Centruma Stokholmê semînerek çêbû. Semîner li ser alfabe, devok, zarava û zimanê yekgirtî bû. Semîner ji aliyê Yekîtiya Rewşenbirê We-latparêzên Kurdistanê ve hat amadekirin. Semîner ji du beşan pêk hat: 1- Devok, zarava û yekîtiya zimanê Kurdi bû. Ev beşa semînerê ji aliyê Avdulwahîd Bavî ve hat pêşkêşkirin. Beşa du-duyan "Alfabe û Yekîtiya Ziman" bû. Ev beş ji, ji aliyê Amed Tigrîs ve hat pêşkêşkirin. Di dawiya semînerê de, di nav beşdaran de gotûbêj çêbûn. Em di vê hejmarê de, bi kurtayî axaftina Amed Tigrîs ji we xwendevanên xwe re pêşkêş dikin. Di hejmarên bê de ji em dê axaftinê hevalên din biweşinîn.

meynî di nav peteweya Kurd  
de berdaye holê. Ziman edeb  
û kultura, Kurdî ji hevûdu  
dûr dixe. Ji wan her yek zi-  
man û kultura Kurdî ber bi

İmkanêni ji hevûdu dûrxistina  
devok û zaravayan çedikin  
Cudabûnê pêk tînin. Herwi  
ha ew ne yekitiya ziman, be  
lavbûna wî bi xwe re tînin.

be. Ji bo perwerdeyeke giştî  
pêwist e ku alfabe xwedî tay-  
betiyêñ wiha be. Ne ku li go-  
her devoka gund an jî ya ba-  
jarekî alfabe bê çekirin. Mi-



Amed Tigris

Yekîtiya devok û zaravayêñ Kurdi, bi yekîtiya alfabe, rastnivîsandin û gramera Kurdi ve girêdayî ye. Ango yekîtiya alfabeya Kurdi pêngava ye kemîn a zimanê Kurdi yê yekgirtî ye. Her netewe an ji gel yek alfabe yeke wî heye. Ango yek netewe û yek alfabe. Alfabeyên cuda, yekîtiya devok û zaravayan çenake. Berevajî wan ji hevûdu dûr dixe. Her zarava û devokekê ber bi zimanekî serbixwe ve dibe an ji, jê re alîkarî dike.

aliyê dewleteke dagirker ve  
dibe. Yekîtiya zimên heta ci-  
hekê yekîtiya netewe ye. Cu-  
dabûna ziman û alfabyeyê, cu-  
dabûna neteweyê ye. Wek  
mînak, haya me Kurdên Ba-  
kur ji edebiyata cihanê heye.  
Bi taybetî bi edebiyata Ewrû-  
payî ya nûjen (modern) heye;  
lê em Goran, Abdullah  
Pêşew nas nakin. Ji ber ku  
em bi alfabeşa Erebî nizanîn.  
Ev tişt ji bo Kurdên Başûr ji  
derbas dibe û bi taybetî dê ji  
iro pê ve ji derbas bibe. Ew ji  
nikarin me nas bikin.

Alfabeyên cuda dengên  
cuda derdixin. Yekbûna deng  
û tîpan li navê namîne. Yekî-  
tiya ziman xerab dibe. Wek  
mînak di alfabeşa Erebî ya  
Kurdî de dengê “i” nayê ni-  
visandin. Ji ber vê yekê jî, tî-  
pa “i” di alfabeşa Kurdî ya E-  
rebî de nîn e. Lê, di dengê a-  
xaftinê de “i” heye. Herwiha  
deng û alfabeşa Kurdî birîn-  
dar dibin.

Cudabûna alfabeyan, devok û zaravayan zêde dikin.

Zêdebûna alfabeyan ji a  
liyê psîkolojîk ve ji tesireke  
negatîv li ser mirovan dihêle  
Morale gel xerab dike. De  
moralize dike. Hest û dax-  
wazên yekîtiya neteweyî sist  
û jar dike. Mirov di dibis-  
tanên Swêdi de vê yekê baş-  
dibine. Dema di zimanê zik-  
makî de du alfabe û du ma-  
mosteyêñ Kurdi derdikevin  
holê şagirt û xwendekarêñ  
Kurd û biyanî pirs dikin. “Çi-  
ma du mamosteyêñ cuda û  
du alfabeyêñ we yên cuda he-  
ne?”

Pêwist e ku alfabe ji aliyê pedagojik û tekniki ve ji gelek hesan be. Alfabeyeke sade be. Li gor nuansen dengen heremî û devokan alfabeyen neteweyî û perwerdeyî neyene çekirin û amadekirin. Alfabe heta ku mumkun be, divê kêmhejmar be. Ango divê hejmara tipen wê kêm bin. Pêwist e ku sergêji û problemen wê kêm bin an ji tune bin. Ji aliyê tekniki ve ji, divê disa alfabe gelek hesan

rov dema li alfabyen Ewrû-  
piyan bi çavéki lêkolînî û bi  
hûr û kûrahî dinêre, ew ray-  
betiyen ku me bi nav kir di  
wan de baş dibîne. Ji bo me  
Kurdan iro alfabyeke wiha  
pewist e. Alfabya ku bersiva  
hemû devok û zaravayen me  
bide hebe. Ev alfabe ji, bi di-  
tina min alfabya Celadet Bedir-  
xan bi xwe ye. Di demeke  
wiha nazik de, hezar mixabîn  
hinek kes û derdor dixwazin  
alfabya zaravayê Zazakî ji ya  
Kurmancî dûr bixin û wê  
nêzî ya Tirkî bikin. Armancû  
xebata van kesan ci dibe bila  
bibe, ew kes ji dijmin re xiz-  
met-dikin.

Alfabeyên cuda, ji aliye çap, bazirganî û piyasê ve ji li pêş zimanê Kurdî kosp û asteng e. Kurdên ku bi alfabeşa Erebî nizanin, nikarin berhemên ku bi wê alfabeyê derketine bixwînin û jê fêde bibînin. Herwiha yên ku bi alfabeyên Latinî û Kirîli ji nizanin, ew ji nikarin berhemên ku bi van alfabeyan

derdikevin bixwînîn. Ji ber van sedeman piyase û bazara Kurdî di nav tixûbêñ alfabe-yan de teng dibe. Ji ber van sedeman jî pirtûk, rojname û berhemêñ niyîsî li seranserê Kurdistanê belav nabin. Kurdîro bi qasî 30–35 milyon in. Neteweyeke gelek mezin e. Bazar û piyaseya Kurdan jî mezin û berfireh e. Lî, hezar mixabin ev alfabeyêñ cuda baz û piyaseya Kurdî ya mezin û berfireh gelek teng di-ke. Ji Kurdan re alfabeyeke tekuz û vekgîrtî pêwist e.

## PÊSEROJ YA ALFABEYA LATİNİ YE

Wek em hemû pê dizanin, zimanê Kurdî di cîhanê de, di nav grûba Hînd-Ewrûpa de ye. Taybetiyên her grûbi heye. Taybetiyên herî bingehîn ku grûban ji hêvûdu cu- da dikin, taybetiyên fonetik, morfolojîk û sentaks ên grûbêz zimanan in. Ji ber van taybetiyan jî, ji Kurdi re jî alfabebla herî lêhatî baş ya Latînî ye. Pirraniyâ zimanzañ û mamosteyên Kurd û Kurdi jî, vê rastiyê qebûl dikin. Alfabebla Erebî û Kîrlî hem ji ber van sedem û hem jî, ji ber sedemê teknikî û pratikî ji zimanê Kurdi re nabin. Divê rojekê zûtir Kurd bi tenê alfabeleyekê bi kar bînin. Ew jî ya Latînî ye. Héta niha gelek kes li gor zanîn û bawerîya xwe alfabeleyen Latînî amade kirine. Lê, di pratikê de, ji derî alfabebla Celadet Bedirxan alfabeleyen din jiyan nedîtine. Ji ber ku ew kes ew taybetiyên ku me li jor destnişan kir negirtine berçavan. Zanîneke wan hûr û kûr li ser ziman tune bûye û tune. Li gor zanîn û devoka xwe alfabe pêşkêş kirine û dikin. Min bi xwe ev nêzikî 10 salan in ku wek mamosteyê Kurdi bi vê alfabebla Celadet kar kiriye û dikim. Min kemasiyên wê ji aliye deng ve nedîtine û tengasî nekişandiye. Lê, ji aliye denglêkirina çend tipan ve mirov dikare li ser biaxive û gotûbêjan bike. Ev alfabebla han bersiva hemû dengê Kurdi dide. Ji aliye pedagojik û teknikî ve jî, mirov dikare bêje alfabeleyekê tekuz û modern e. Alfabebla Kurdi ya Latînî, mirov dikare bêje li gor standartê alfabeleyen Ewrûpi ve.


Ronakbîrêن Başûr, Rojhîlat û yêن li Sovyeta kevin, divê ji bo alfabyeke yekgirtî hewl bidin. Di kovar, rojname û civînêن xwe de, li ser alfabyea Latinî binivîsinin û gotûbêian ges û xwes bikin.




Piştî hilweşandina sistema Yekîtiya Sovyetê, pêleke liberal li cîhanê dest pê kir. Ev pêla liberal ku bi navê liberalizma nû tê naskirin, di pirr warê cur be cur de, xwe nîşan dide. Di warê ekonomiyê de ev pêla liberal, xwe di xurtkirina rekabetê de, di dijîtiya dewletê de, di dijî sosyalizmê de û di xurtkirina bazarê de sixletên xwe yên lewîti nîşan dide. Bi vê pêla liberal re danûstandinê mirovati, bûne danûstandinê ekonomik. Pere bûnê weke normên ehlaqî. Kesê xwedî pere û dewlemend weke qehremanê demê têne dîtin. Pirr kes van bi tiliya nîşanî hevdu dide. Di civaka kapitalist û liberal de pere ketine şûna esaletê, paqijiye û bedewbûnê. Mêranî, mirovati, ehlaq, kultur, hevkarî û zanyarî hemû bi peran û dewlemendiyê ve têne pîvandin. Mirov ji hev re dibêjin; çiqas perê te hene? Marqa texsiya te ci ye? û hwd. Lî pirr kêm kes ji hevdu diprisin; zanyariya te, di kîjan warî de heye? Ci kar ji destê te tê? Te dilê çend mirovan dilşa kiriye? û hwd.

Ev pêla liberalizmê ya nû, bi xwe re ideolojiya mirovan jî, diguherîne. Kesê ku berê ji xwe re digotin; liberal, sosyalist, komunist, konservatif û gelek navê din, iro dibêjin: Em bê ideoloji ne!.. Em demokrat in!.. Gotina demokrasî bûye weke mifta (kilita) canbaziyê. Kesê zexel demokrat e û kesê jîr jî demokrat e. Kesê diz demokrat e û kesê ku rastiyê û welatperveriyê diparêze jî demokrat e. Bi kurtî mirov dikare bêje; hemû kes bûne demokrat! Ma gelo kes di wêre bêje; ez ne demokrat im! Erê, ez dibêjim; ez ne

**RÊHEVAL DELÎL  
(İLHAN ÇİFTÇİ)**  
Ey şehîd ey şehîd  
Tu çiqas bilindî  
Ji çiya bilindirî  
Ey çemê Dicle  
Çiqas tu bi lezî  
Delîl ji te bi leztir e  
Çiyayê Kurdistanê  
Çiqas tu asê yî  
Delîl ji te asêtir e.



Girtiyen Welatparêzên Şoreşger  
Li Bendîxana Saxmâcilar  
Çetin Arkaş  
Erdem Kahraman  
Ayfer Kordu



Ferdinand Hodler (1892)

# DAWIYA DÎROKÊ?

*Ma gelo bi rastî dawiya dîrokê hatiye?*

**Mirov weke zarok ji dayika xwe re çêdibe, paş re dibe xort û zilam û di dawiya dawî de jî, mirov dimre. Hegel ev tişt weke ku wê dawiya dîrokê bê fam dikir. Mirina mirovan dihat mana dawiya dîrokê.**

**Li gora Hegel konaxa dawiya dîrokê, li Prusya yê xelas dibû. Lî em hemû baş dizanin ku pêşketina dîrokê, weke Hegel gotibû, li Prusya yê nesekinî. Dîrok heta iro jî her berdewam e...**

## Şerefxan Cizîrî

demokrat im lê baweriya min bi demokrasiyê heye. Ji ber kû demokrasi tiştek e û demokratbûn jî bi serê xwe tiştekî din e.

Ev demokrasiya ku bi kérî hemû kesan tê û dikare hemû girêkê civakî, ekonomik, kulturî, sosyal û hwd. veke, di rastiya xwe de demokrasiyeke ji hev dû ketiye. Ev demokrasi bes di fantaziya mirovan de, dikare hebe. Ev demokrasiyeke ku, di bin-gehê xwe de, ne demokrasiya rastî ye. Di rastiya xwe de ew benîstê etara ye! Ji ber ku demokrasi bê naverok nabe. Naveroka demokrasiyê jî, ji ideoloji û politikayê pêk tê.

Mirov nikare vê yekê jî, ji menfeetê çinayeti, izolê bike. Kesê ku bike jî, xwe dixapîne. Weke ku em hemû ji baş dizanin, di civakên kapitalistî de, xwe xapandin yek ji problemen civakê yê bingehînî ye. Felseseya kapitalizmê li ser hevdu xapandinê ava bûye. Bi baweriya min hevdu xapandin, di dawiya xwe de, xwe xapandine...

Di warê ilmî û kulturî de jî, ev kesenî liberal dibêjin ku, dawiya dîrokê hatiye. Dîroka mirovatiyê gihaye qonaxa xwe ya dawî. Civaka kapitalist û liberal li gor van kesan, civaka herî bi rîk û pêk e. Demokrasiyeke pirralî xwe di vê civakê de, daye nîşandin da ku heq û hiqûqê mirovan (kesa), bi awayekî xurt bêne parastin. Azadiya fikri û weşanê heye. Ku mirov bixwaze, dikare komele û partîyan ava bike. Ci tiştê ku ji bo mirovatiyê pêwist be, di civaka liberal- kapitalist de heye. Kapitalizm cinneta bakî ye...

Ma gelo bi rastî dawiya dîrokê hatiye? Ewê ku cara yekemîn behsa dawiya dîrokê dikir, filozofê mezin Hegel bû. Di ditina xwe ya li ser dîrokê de Hegel, xwedî bawerî û felsefeyeke pirr kür bû. Li gora vê dîtinê, hemû pêşketin xwedî armancê

berbiçav bûn. Ci tiştê ku bi jiyana mirovan û tebietê ve girêdayî bû, weke bûyer, serpêhatî, şer, şores, mirin, jiyan û hwd. hinek armancê mirovatiyê bi cih dianin. Armançê hemû pêşketin jî, li gora Hegel avakirina dewletê bû. Dewlet ji aliye kî ve, armanca pêşketinê bi xwe bû û ji aliye din ve jî, qonaxa dawiya dîrokê (istasyona dawî) bû.

